Rupel 1welat +++++++:Layout 1 17.09.2010 17:09 Page 1

# EM DIBÊJIN HIRÇ LI VIR E ERDOGAN LI DEWSÊ DIGERE




**Qetlîama Peyanisê qewimîna yekemîn nîn e. Li Basayê, li Elkê, li Şemzînanê... heman hovîtî hatin kirin. Qatilan her carê îmzeya xwe li cihê bûyerê hişt. Û rayedar vê îmzeyê 'nedîtî' dihêlin**

'Zarokên baş' ên dewletê li pey her kirineke xwe şopa xwe dihêlin û direvin. Wan herêma Colemêrgê ji xwe re kiriye hedef. Her carê li vir derdikevin holê. Û baş dizanin ku ew îmze ji bo wan temînata terfîkirinê ye

Di serî de Serokwezîr Erdogan rayedarên dewletê li dewsa xwediyên îmzeyê ku 'tên zanîn' bigirin. Li ber digerin ku dewsa wan li pey xwe hiştiye ji holê rakin. Em dibêjin 'hirç ev e', Erdogan dewsa wê 'paqij' dike

Di nava 5 salên dawî de çend caran heman hovîtî hatibe dubarekirin, encam eynî bûye. Qatilên li Peyanisê jin û zarok jî di nav de sivîl kirine hedef dîsa îmzeya xwe li cihê qetlîamê hiştin û çûn



www.welat.com

# Rojeva Welat

18 Îlon 2010 Şemî Buha: 50 Kr Hejmar:11

E-mail: awelat2002@yahoo.com

## Şemzînan, Elkê, Basa Çelê û niha jî Peyanis

'Zarokên baş' ên bi giştî mînîbûsan dikin hedef. Li Basayê 11 gundî, li Hemkana Elkê 12 gundî, niha jî li Peyanisê 10 gundî... Bi heman rêbazê qetilkirin. Li Şemzînanê jî pirtûkxane ji xwe kiribûn hedef. Lê li ser kar hatin girtin. Li Basa û Hemkan dewletê dewsa wan demeke dirêj 'nedîtî' hişt. Her ku kirin jî bi îtirafan aşkera bûn. Ligel ku hertişt zelal e dîsa jî derbarê kiryaran de lêpirsîn nayê kirin. *RÛPEL -2-3*

# Boykota ziman dewletê diricifîne

Serokwezîr Erdogan têkildarî boykota ziman BDP rexne kir û bi derqanûnîbûnê tewambar kir. Hevserokê BDP'ê Demîrtaş bersiva Erdogan da û got: 'Erdogan jî boykot pêk aniye û keça xwe li Amerîkayê daye xwendin.' Pêla boykota ziman her diçe gur dibe

## Qatilan vê carê li Geverê êrîş kir 10 BIRÎNDAR

Cenazeyên Canê Dayan û Semîha Dayanê duh li Gevera Colemêrgê hatin definkirin. Bi deh hezaran gevêrî beşdarî merasîma cenaze bûn. Piştî cenazeyê hêzên tarî yên dewletê careke rûyê xwe nîşan da û êrîşî gel kirin. Girseya li ser cadeya Cengîz Topel qetlîama Peyanisê protesto dikir, bû hedefa teqîneke din. Li ber Kargeha Geverê teqîn pêk hat. Di encama teqînê de piraniya wan sivîl herî kêm 10 kes birîndar bûn... *RÛPEL -3*



## Ji Mûşê banga ji bo bêçalakîtiyê

56 rêxistinên sivîl ên civakî yên Mûşê têkildarî bêçalaktiya ku di 20'ê îlonê de bi dawî bibe li Odeya Pîşesaziyê û Bazirganiyê daxuyanî da çapemeniyê. Berdevka Demê ya KESK'ê Derya Yolcu daxuyanî xwend û diyar kir ku bûyera li Colemêrgê pêkhat provoksayone û xwest ku hikûmet berpirsiyarên bûyerê zelal bike. Yolcu, anî ziman ku buyera li Colemêrgê diyar e ku ji aliyên hêzîn tarî ve pêk hatiye û wiha got: "Ji bo ku bûyerên wisa pêk neyên divê hikûmet berpirsiyaran derxe holê." Yolcu banga rawestandina operasyonan li hikûmetê kir. *RÛPEL - 5*

### Ciwan dibin redkarên wijdanî

Tevgera Reda Wijdanî li Cîhanê yekem car bi ciwanê ku li Welatê Numidyayê tevlibûna artêşa Romayê redkir û hate darvekirin dest pêkir. Li Tirkiyeyê jî di pêvajoya şerê 30 salan de jî bandora xwe nişanda. Komek ciwanên kurd ji ber pirsgirêka kurd bi slogana "Neçe leşkeriyê û xwîna birayê xwe nerjîne" amadekariyên daxuyaniya reda wijdanî dikin... *RÛPEL - 5*



### PIŞTGIRIYA JI BO BOYKOTÊ ZÊDE DIBE

Mamosteyên Wargeha Penaberan a Mexmûrê piştgirî dan boykota TZPKurdî. TUHAD-FED û DIYAR TUHAD-DER piştgirî dan biryara 'Boykot'ê. Rêveberê DIYAR TUHAD-DER'ê Mehmet Încîr diyar kir ku mafên kurdan yên bingehîn û pirsgirêka kurd tê pêşguhkirin û kurd tên înkarkirin. Pêla piştgiriyê ya ji bo biryara boykota dibistanan her ku diçe xurt dibe

### 'BIRYAR A TZPKURDÎ YE, EM PIŞTGIRIYÊ DIDIN'

Hevserokê BDP'ê Selahattîn Demîrtaş, bersiva hikûmet û Serokwezîr a biryar TZPKurdî ya boykota dibistana da û wiha got: "Serokwezîr berê ji ber azadiya baweriyê tune ye keça xwe ya bi turban dibistanên Tirkiyeyê boykot kir li Amerîkayê da xwendin. Niha Serokwezîr dibêje boykot sûc e. Biryara boykotê biryara TZPKurdî ye. Em partî jî piştgiriyê didinê... *RÛPEL - 4*

## Êrîşî merasîma ji bo cenazeyan kirin

Girseya li Colemêrgê beşdarî merasîma cenazeyê Eşref Gur ê ligel 10 kesên di teqîna li gundê Peyanisê de jiyana xwe ji dest dan, bûn rastî mudaxaleya polîsan a bi bombeyê gazê hatin. Her wiha lêzimên kesên di mînîbûsê de hatine qetilkirin der barê qetlîamê de agahî dan û bertek nîşanî manîpûlasyona rayedaran da. Colemêrgiyên bi heman mebestê li hemberî çapemeniya tirk nerazîbûna xwe anî ziman... *RÛPEL - 3*

## Pêşketina diyadeya netewebûnê

Wexta ku civak weke civaka komîn a destpêkê, civaka dewletê û civaka demokratîk di nava xwe de tê dabeşkirin, ev bi pirsgirêkên rêveberî û çînîbûnê re têkildar e. Dabeşbûna di çarçoveya rastiya netewe de zêdetir bi bûyerên siyasî, hiqûqî, çandî û ziman diyar dibe. Ne bi tenê şêweyekî neteweyê, mirov dikare behsa şêweyê gelek neteweyan bike û ev manedartir e. Ne neteweyên li ser heman hîmî avakirî, lê belê mumkin e ku mirov behsa yên li ser hîmên gelekî ji hev cihê avabûne, bike... *Nivîsa Abdullah Ocalan* *RÛPEL - 8*

www.arsivakurd.org

# Mayina li Colemêrgê nas e!

## Hêzên dewleta tirk li Kurdistanê û bi taybetî jî li Colemêrgê li ser hev xwîna sivîlan diherikînin. Bûyerên ku berê nepenî pêk dianîn vêca pêdivî bi veşartinê jî nabînin.

**COLEMÊRG / DÎHA** - Teqîna li gundê Peyanisê ya Colemêrgê ku 4 roj beriya bidawîbûna birayra bêçalatiya KCK'ê pêk hat û 10 kesan jiyana xwe ji dest da, teqîna di sala 2009'an de li Çelê ku beriya hevdîtina DTP'ê û Serokwezîr pêk hatibû û 7 leşkeran jiyana xwe ji dest dabû, bibîranî. Di 27'ê gulana 2009'an, beriya hevdîtina Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk û Serokwezîr Recep Tayyîp Erdogan de, li navçeya Çelê di encama teqîna mayinê de 7 leşkeran jiyana xwe ji dest dabûn. Wê demê çapemeniyê hewl dabû ku bûyerê têxe stuyê PKK'ê. Serokwezîr jî beriya hevdîtinê got, "Heta ku ji PKK'ê re nebêje terorîst, ez destê wî nagirim" û hevdîtina xwe ya bi Turk re betal kiribû.

Ligel ku gotibûn tu eleqeya wan bi mayina bûye sedema mirina 7 leşkeran tuneye, çapemeniyê bûyer xistibû stûyê PKK'ê. Serfermandariya Giştî ji bi daxuyaniyê ev helwesta çapemeniyê piştrast kiribû û gotibû ku teqemenî ji aliyê endamên PKK'ê ve hatiye bicihkirin. Lê piştî van daxuyaniyan di 25'ê hezîrana 2009'an de qeydeke deng derket holê û hemû îdîayên Serokwezir, Serfermandarê Artêşê derew derxistibûn. Di hevdîtina telefonê ya di navbera Fermandarê Tumena Colemêrgê Tumgeneral Gurbuz Kaya û Fermandarê Tugaya Çelê Tuggeneral Zekî Es de dihate gotin ku mayina li Çelê teqiyaye ji aliyê leşkeran ve hatiye bicihkirin. Gotina Yarbay Taner ya wakî "Me ji jor (Fermandariya Giştî) re gotiye, PKK mayin daniye" ku di çapemeniyê de cih girtiye, jî dide nişandan ku pêvajo çewa hatiye derbekirin. Piştî teqîna li Peyanisê pêk hat, dîsa wekî Çelê, xistin stuyê PKK'ê. Lê KCK'ê bi daxuyaniyekê bûyer wekî "Teqîn bûyerek kontaye" îlan kir û bûyer şermazar kir.

### Mayina leşkeran ji bir kir

Serokwezîr ku pişti teqînê daxuyanî da, bûyer şiband bûyera Çelê, ku bûbû sedema betalkirina hevdîtina wî ya bi Ahmet Turk re ya wê demê û got ku mixabin dîsa beriya hevditineke ev teqîn pêkhatiye. Lê Serokwezîr nexwest bîne bîra xwe ku piştî demekê derketibû holê, mayina li Çelê ji aliyê leşkeran ve hatibû bicihkirin.

Çapamenî û rayedarên dewletê her çiqasî xwestin bûyerê bavêjin ser PKK'ê jî, him mihîmat û meterlayên li cihê bûyerê hatin dîtin û him jî çenteyê nivîsa "Bîranîna Colemêrgê a Tugaya Çiya û Komando" û belgeyên nivîskî ên "KKK 8'emîn Fermandariya Navenda Ana Bakim a Afyonkarahisar, Rêgeha bi kar anîne a bi ser navê parêzgera Balistîk AQAP-2120, Hejmara Amûrê: KSK: 107" derketin û şahidên bûyerê jî dibêjin ku êrîş ji aliyê PKK'ê ve pêk nehatiye. Parlementerên BDP'î yên êrîş wekî "Şemzînana duyem" bi navkirin û nirxandina "dewlet cara duyem wekî ya li Şemzînanê li ser sûc hatiye girtin" kirin. Parlementerên BDP'î balkişandin ser teqînên beriya niha li Colemêrgê qiwimîn û li gel xwestin bavêjin ser PKK'ê ku piştre wekî sûcên dewletê derketin holê.


Çend mînakên ji dehan bûyerên li Colemêrgê qewimîn û xwestin têxin situyê PKK'ê û piştre derketin holê ku ji aliyê PKK'ê ve nehatine kirin.

### Mînak pir in

Li Colemêrgê û navçeyên wê ji sala 2005'an û vir de bûyerên xwestin têxin stuyê PKK'ê, lê bi belge û agahiyan derket holê PKK'ê ne kirine nêzî 30 teqîn û kuştin qewimîn.

Di 12'ê tebaxa 2005'an de kesê bi navê Yusuf Yaşar, piştî ji navenda Colemêrgê hat revandin, li ser Rêya Kavakliyê hat kuştin, di 9'ê mijdara 2005'an de Mala Pirtûkxaneyê ya Umut ji aliyê xebatkarên JÎTEM'ê astsubay Alî Kaya, Ozcan Îldenîz û îtîrafkar Veysel Ateş ve rastî êrîşa bi bombeyî hat. Di encama êrîşê de jî Zahîr Korkmaz û Alî Yilmaz jiyana xwe ji dest dan. Piştî êrîşê belge û dokumanên krokîyên hatine xêzkirin û ji bombebarankirina mizgeftan heta kesên dê bikujin hatibûn dîtin. Piştî belgeyên derketin holê, bûyera Şemzînanê heta demek dirêj ji rojevê derneket, Ferhat Sarikaya ku têkildarî doza Şemzînanê îdîaname amade kir, di serî de piştî navê Serfermandarê Giştî yê demê Yaşar Buyukanıit û hind fermandaran tê de derbas bû, peywirê hat avêtin. Gotinên Yaşar Buyukanit derbarê êrîşkar Alî Kaya de gotina "Ez dinasim zarokê baş e" rojev bi giştî guherî.

Li ser pêkutiyan doza Şemzînanê ku ji rojevê ket, Serokwezîr Erdogan ku di destpêkê de got "Heta dawî dê bi ser bûyerê de biçin", piştî dozger ji peywirê hat girtin, bi gotina "Gelê Şemzînanê nikare şahidiyê bike" bi paşve gav avêt. Piştî helwest guherî jî dosyeya Şemzînanê şandin dadgeha leşkerî û bersûc hatin berdan û bûyer nehatin ronîkirin.



### Colemêrg kirine warê qetl û xwîn ê

Li Colemêrg û navçeyên wê ji sala 2005'an û vir de hin bûyerên qewimîn... PKK'ê têkildarî hemû bûyeran daxuyaniya, "Bi van bûyeran re tu eleqeya me nîne" dabû.

✓ Di 5'ê tebaxa 2005'an de di Piştî belavokên BŞKYK (xwîna pênç şehîdan dê li erdê nemîne û ji bo her leşkerî dê 5 sivîl bên kuştin, nivîsî bû.)gelek bombe hatin teqandin.

✓ Di 15'ê tîrmeha 2005'an de li Colemêrgê, bombeya ku dui wesayîta cerdevanek teqiya de 2 kes bi sivikî birîndar bûn.Eleqeya PKK'ê pê nîn bû.

✓ Di 5'ê tebaxa 2005'an de di encama teqîna bombeya li ber Fermandariya Cendirmeyan a Şemzînanê hat hiştin û teqiya de 5 leşkeran jiyana xwe ji dest dan û leşkerek jî bîrîndar bû.

✓ Li Geverê di encama bombeya di 31'ê tebaxê de teqiya de xisarên madîçêbûn.

✓ Di 1'ê îlona 2005'an de Konê Aştiyê yê bi minasebeta Roja Aştiyê ya Cihanê li Şemzînan hate vekirin bombe lê hate cihkirin. Bombeya ku teqiya 14 kes bîrîndar kirin.

✓ Di 7'ê sibata 2005'an de li Geverê di otobusekê de teqînpêkhat.

✓ Di 15'ê îlona 2005'an de li kata 4'an a Navenda Kar a Zagrosê teqîn pêkhat .

✓ Di 7'ê îlona 2005'an de li Şemzînanê di wesayîtekê de teqîn pêkhat

✓ Di 11'ê cotmeha 2005'an li Colemêrgê teqîn pêkhat.

✓ Di 20'ê cotmeha 2005'an de li Geverê teqînek pêkhat *.

✓ Di 24'ê cotmeha 2005'an de li Geverê teqîn pêkhat. Zirarê madî çêbû.

✓ Di 28'ê cotmeha 2005'an de li Geverê êrîşekî bi roket pêkhat.

✓ Di 28'ê cotmeha 2005'an de di çopa li ber Lojmanên Maliyê ya Şemznanê teqîn pêk hat.

✓ Di 1'ê mijdara 2005'an deli Şemzînanê teqînek pêk hat.

✓ Di 12'ê tebaxa 2005'an li Çemê Benavê yê Colemêrgê Yusuf Yaşar ji aliyê JÎTEM'ê ve hate qetilkirin.

✓ Di 27'ê gulana 2009'an de di encama teqîna li Çelê 7 leşkeran jiyanan xwe ji dest dabû. derket holê mayin yê TSK'ê ye.

✓ Di 27'ê tîrmeha 2010'an de li Kolana Komarê teqînek pêkhat û zirara madî pêk hat.



Medenî Ferho
medeniferho@hotmail.com

# Di demeke ku!..

Min digot, ez ê di nivîsa xwe ya roja şemiyê de, hatina Mr. Ahtîsaarî û koma pê re binirxînim. Ji ber ku bi salan e, li hundir û derve tê pirsîn; Kurd çi difikirin û çi dixwazin?

Kesî heya weke îro, ji rayedarên Tirkiyê ne pirsiye, "hûn ji bo pirsgirêka kurd çi difikirin û çi dibêjin?" Ji ber ku li hundir û derve, pirsgirêka kurd ji terorîze kirinê xelas nebûye.

Piştî referandumê ku gelê kurd, sîstema Tirkiyeyê red kir; Mr. Ahtîsaarî û koma pê re hatin Tirkiyeyê û derbasî Kurdistanê bûn. Ji bedêla ku bêjin, "êdî wextê çareseriya vê pirsgirêkê hatiye", gotin em hatine ku dîtinên wan bistînin û daxwazê wan bibihîzin.

Lê "zarokên baş" yên Serfermandariya Artêşa Tirk, nehiştin.

Di demeke ku pirsa "kombûna antî-hiqûqî ya hêzên Artêşa Tirk li Kurdistanê" kete rojevê, li Colemêrgê teqînek ku nasnameya wê diyar e, pêk hat û birrek kurd hatin kuştin.

Di demeke ku, pirsa 'navendî ademiyet' derî demê maye û nikare pirsgirêkan çareser bike, kete rojevê, "zarokên baş" car din li Colemêrgê komkujî kirin.

Di demeke ku, kontrola li ser eskeriyê nebe, li wir faşîzm heye û hiqûq tê binpêkirin, kes jî nikare behsa demokrasî bike, bû dabaşa nivîs û nîqaşan, kontra li Colemêrgê komkujî kir.

Di demeke ku, girêdan û "sevk û îdare kirina kontra" dibin kontrola fermandarên hêzên Artêşa Tirk û serfermandariya Artêşa Tirk de tê kirin, dihate dikirandin, komando, mayin di rê de bi cih kir û komkujî pêkanî.

Di demeke ku, komkirina hêzên Artêşa Tirk li Kurdistanê û kiryarên wan antî-hiqûqî dihatin nirxandin, Tîma Xançer û kontrayên JITEM'ê teqîn pêkanî û komkujî kir.

Di demeke ku, dihate gotin, li netew-dewletan, hiqûq nîne, li netew-dewletan hiqûqê hêzan heye, li Colemêrgê komkujî pêk hat.

Di demeke ku, vekirî dihate gotin; di hiqûqê hêzan de, kontra, JITEM, TÎT, Tîmê Xençer, mirovên Yeşîl, Kirca, Axca, û hwd. derdikevin holê û ev mêrkuj jî bi peymanên feodal û barbar her cûre karên kujerî dikin, komkujiya li Colemêrgê pêk hat.

Di demeke ku dihate gotin, Tirkiyê îdîa dike ku dewletek laîk e, lê bacûbêşa ku ji Elewiyan, Xiristiyanan, Êzdiyan, Ataîstan û hwd. berhev dikin û didine Serokatiya Diyaneta Îslamê û ev jî di dewletên demokrtaîk de karekî antîhiqûqî ye û wek karekî newekheviyê, serdestiyê dihate nirxandin de, li Colemêrgê komkujî pêk hat.

Di demeke ku nîqaşa "hindik dewlet, bêhtirîn civak" dest pê kiribû, kokujiya li Colemêrgê pêk hat.

Di demeke ku kurdan, di referandumê de, Xweseriya Demokratîk, wek alternatîfa netewe-dewletê derxiste pêş û got; netew-dewlet kevneşopî û kevneperestiya ne li gorî demê ye, komkujiya li Colemrêgê pêk hat.

Lewma ez naxwazim gotinên gurover bêjim û siyaseta "hamasat" bikim. Tirkan, şer dijwar kir û wê bêhtirîn dijwar jî bikin. Ji ber ku, dema bêçalekîtiyê, îro, sibe xelas dibe. Fermandarê hêzên bejayî Org. Erdal Ceylanoglu, di arîfeya cejna Remezanê de dilê Kurdistaniyan teva dax da û 9 ciwan, bi bêbextiyeke tirkanî kuştin. Dengê Tayyîp Erdoganê ku piştî ayanbûna referandumê de got "ji referandumê her kes xwedî paydeyeke xêrdînî derket". Lê piştî komkujiya Colemrgê, bi zimanekî çort, Haraketa Azadiya Kurd gunehkar kir.

Tayyîp Erdogan, bi van gotinan xwest ku "BARBARIYA XWE" veşêre û rûreşiya komkujiyê, bikê stuwê Kurdan.

Tayyîp Erdogan, di her axaftina xwe de dixwaze wek Azîz Paulus bêje; "erka ji ba Xweda ne hatibe nîne û erka min jî ji ba Xweda hatiye." Tayyîp Erdogan, ji bo ku wek Xwedawend bê naskirin û yadkirin, zalimtî û zulumkariyê dike.

Tayyîp Erodgan weke generalekî haraket dike. Çanda wî jî, mîna generalên keddar, ansiklopedîstî ye. Lewma wek şakirdê her îdeolojiyê diaxive. Di pêvajoya referandumê de jî, parçeyek ji CHPe, parçeyk ji MHPe bir. Lê dît ku kurdan pêça xwe nedayê û ew li Kurdistanê rezilandin, Colemêrg hedef nîşan da.

Biqasî ku komkujiya Colemêrgê, bersiva rezilandina sîstemê û Tayyip Erdogan bû, bersiva hatina Mr. Ahtîsaarî û koma pê re jî bû.

Mr. Ahtîsaarî û koma pê re, nûnerên NY bûn û bersiva xwe jî, bi komkujiya li Colemêrgê standin.

Di vê qonaxa ku dewletê, di qada herî jor û jêr de, têkiliya bi Kurdan re qut kir (hevdîtina bi BDPê re hate rawestandin), Kurd jî pêwiste ne bendeyî bersiva hêzên din jî nemînin.

Êdî pêvajoya çi difikirin û çi dixwazin derbas bûye. Tirkan, piştî komkujiya 9 gerila û 10 Colemêrgiyan, car din kartên xwe vekirî danîn ser masê.

## XAÇEPIRS

**Ji çepê ber bi rastê ve**

**1.** Xwarina ku êvariyan tê xwarin... Meta, serwet **2.** Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tunekirin... Amûreke şer... Tûj **3.** Hejmarên du, çar, şeş, heyşt û hwd.... Afirandina şanoyê ya dilpêşewitîn û pêkenîn pêkve ye **4.** Berhema şanogeriyê ya muzîkdar... Alif, xwarina sewalan **5.** Heke... (Ebdulsamet ...) Li gorî lêkolînan kesê ku teksta herî pêşî a kurdî di salên 970'yî de nivîsî ye. **6.** Cînavaka kesê yekemîn a yekjimar... Lixwekirina piyan **7.** Dijbera germ... Sir, tiştê her kes pê nizane **8.** Notayek... Rojek... Daçekek ku wateyê xurt dike **9.** Cureyekî pûşiya serê jinan a gelêrî... Tiştê ku pê debar tê kirin

**Ji jorê ber bi jêrê ve**

**1.** Cihê ku berhemên şanoyê lê tê pêşandan **2.** Cejn, eyd... Keriyê mî û bizinan... Sendîkaya Karkeran a Swêdê **3.** Rengek... Madeya ku tenê ji hêmanekê hatiye pê **4.** Xwarina ku xwêya wê zêde ye... Dewara nêr **5.** Pirç... Her tiştê têkildarî debara jiyanê 6. Genimê hêrandî... Agir... Peyva neyînî **7.** Kesê ku rê nîşan dide **8.** Mektûb... Sedemkarê tevgerê, paldêr **9.** Bêyom... Alîkarê keyayê gund

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | N | A | ■ | X | ■ | A | R | G | O |
| 2 | O | ■ | S | W | Ê | D | ■ | A | R |
| 3 | T | Î | P | ■ | M | ■ | R | ■ | S |
| 4 | A | ■ | Î | D | ■ | L | A | V | A |
| 5 | ■ | A | ■ | A | S | A | ■ | Î | ■ |
| 6 | E | D | E | N | E | ■ | E | N | E |
| 7 | L | A | M | ■ | D | A | S | ■ | Y |
| 8 | Î | N | ■ | J | ■ | L | A | M | A |
| 9 | F | ■ | Z | I | Y | A | ■ | Û | R |

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | ■ | | | | ■ | |
| 2 | | | ■ | | | | ■ | | |
| 3 | | ■ | | | ■ | | | | |
| 4 | | | | | | ■ | | | ■ |
| 5 | | | | ■ | | | | | |
| 6 | | | ■ | | | | | ■ | |
| 7 | | ■ | | | | ■ | | | |
| 8 | ■ | | | ■ | | | ■ | | |
| 9 | | | | | ■ | | | | |

# Leşker dikuje polîs êrîş dike

## Li her derê Kurdistanê êrîşa li Colemêrgê tê şermezarkirin. Cenaze hatin wergirtin û bi girseyî hatin definkirin, polîs êrîşî girseyê kir û di êrîşê de bombeyên gazê hatin bikaranîn û li Geverê di nav girseyê de teqîn pêk hat

**COLEMÊRG / DÎHA** - Li Colemêrgê cenazeyên 10 kesên ku di teqîna pêr de jiyana xwe ji dest dabûn, hatin wergirtin. Li Colemêrg û Geverê jî esnafan dikanên xwe venekirin. Welatiyên li ber nexweşxaneyê jî bi hinceta ku çapemeniya tirk bûyerê berovajî nîşan dide bertek nîşanî çapemeniyê da û destûr nedan ku li ber nexweşxaneyê bisekinin. .

Li gundê Peyanisê yê Colemêrgê di encama teqîna mayina leşeriyê de 10 welatiyan jiyana xwe ji dest dan û cenazeyên wan ji Nexweşxaneya Dewletê ya Colemêrgê tên wergirtin. Cenazeyên ku tên wergirtin dê li Colemêrg, Gever û gundê Peyanisê tên veşartin. Her wiha li Colemêrg û Geverê jî esnafan dikanên xwe venekirin.

Dema cenaze hatin wergirtin hezaran kes li ber nexweşxaneyê kom bûbûn û diruşmên wekî, "Şehît Namirin", "Kujêr Erdogan", "Tolhildan" berz kirin. Polîsan li ber nexweşxaneyê tebdîrên berfireh girtin.

### Bertek nîşanî çapemeniyê dan

Girseya ku li ber nexweşxaneyê kom bûn, bi sedema çapemeniya tirk bûyeran berovajî vedibêje bertek nîşani çapemeniyê dan. Girsê endamên çapemeniyê yên ji Stenbol,

Enqere û Amedê hatîn ji ber nexweşxaneyê derxistin û tenê destur dan rojnagerên Colemêrgê.

### Li Peyanîsê hatin veşartin

Cenazeyên Aydin Erol, Enes Erol û Abuzet Erol ên ji Nexweşxaneya Dewletê ya Colemêrgê hatin vergirtin, bi konvoya ji 500 wesayîtan pêk dihat, birin Gundê Peyanisê. Dema konvoyan di cihê bûyerê re derbas bû, girse ji wesayitan daket û dirûşmeyên, "Şehîd namirin", "Kujer Erdogan", "Tolhildan" berzikirin. Xizmên welatiyên jiyana xwe ji dest dan



jî li wir hawar û zêmarên xwe bilind kirin û komkujî şermezar kirin. Konvoy di ketina gund de, ji aliyê hezaran kesan ve bi posterên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û alên PKK'ê hatin pêşwazîkirin û bê navber dirûşmeyên, "Tolhildan", "Ocalan", "Kujer Erdogan",

"Bijî Serok Apo" qêriyan. Piştî pêşwazîkirinê bi hezaran kesî bi sirûdên hatin xwendin ve ber bi goristanê ve meşiyan. Piştî meşê jî cenazeyê 3 kesan li goristana gund hatin veşartin

### Polîsan mudaxaleyî meşê kir

Girseya li Colemêrgê beşdarî merasîma cenazeyê Eşref Gur ê ligel 10 kesên di teqîna li Gundê Peyanisê de jiyana xwe ji dest dan bûn rastî mudaxaleya polîsan a bi bombeyê gazê hatin.

Cenazeyê Eşref Gur ê ku duh li Gundê Peyanisê yê Colemêrgê di dolmîşê de ligel 10 kesan di encama teqîna mayina leşkeriyê de jiyana xwe ji dest da ji aliyê hezaran kesan ve ji Nexweşxaneya Dewletê ya Colemêrgê hate vergirtin. Girsê piştî cenaze girt û ber bi Goristana Taxa Yenimahalleyê ve meşiyan rastî mudaxaleya polîsan a bi ava şid û bombeyên gazê hatin. Piştî girsê jî bi keviran bersiv da polîsan bûyer derketin. Bûyer didomin.

### Li Geverê teqîn

Li Geverê di merasîma cenazeyên kesên di teqîna pêr de jiyana xwe ji dest dan de, teqîn pêk hat. Di bûyerê de gelek kes birîndar bûn. Piştî bûyerê gelek ambulans çûn cihê teqînê.



### Licêyî dikanên xwe venekirin

BDP'a Licê bûyera li gundê Peyanisê yê Colemêrgê şermezar kir û neçûn ser kar û dikanên xwe venekirin. BDP'a Licê, bi armanca bûyera li gundê Peyanisê yê Colemêrgê pêk hat û bû sedema kuştina 10 welatiyan şermezar bike li ber avahiya partiyê daxuyaniyê dan çapemeniyê. Serokê BDP'a Licê Sedat Şahînlî, Şaredara Licê Fikriye Aytîn û gelek welatî beşdarî daxuyaniyê bûn. Rêveberê BDP'ê Îdrîs Ozbahçivan, daxuyanî xwend. Ozbahçivan, anî ziman ku ev bûyer provokasyon e û xwest hikûmet bûyerê ronî bike.

Daxuyanî bi dirûşmeya "Şehîd Namirin" bi dawî bû. Welatî û esnafên navçeyê jî bi armanca şermezarkirinê neçûn ser kar û dikanên xwe venekirin.

## Çima piştî teqînê operasyon nehat destpêkirin?

**COLEMÊRG / DÎHA** - Serfermandariya Giştî têkildarî teqîna pêr li gundê Peyanisê daxuyaniyek da û got;"PKK bûyer pêk anîye". Lê piştî bûyerê tu operasyon nehat destpêkirin. Welatiyên bajaroka Slihê jî hatin cihê bûyerê û bi alavên leşkerî yên li cihê bûyerê Serfermandarî derew derxist. Ji ber ku piştî teqînê operasyon nehatine dest pê kirin "Tîma Xençer" bibîr hat.

Şahidên teqîna nêzî gundê Peyanisa Colemêrgê, bertek nîşanî daxuyaniya Serfermandariya Giştî ya ku gotibu "Teqîn ji hêla PKK ve hatiye kirin", dan. Şahidên bûyerê û gundiyên Peyanisê balkişand ser xemsariya leşkerên li cihê bûyerê. Gundiyan, da zanîn ku li hemû herêmên ku teqîn pêk tên, piştî bûyerê operasyon tên destpêkirin lê piştî vê teqînê tu operasyon nehatine destpê kirin. Cerdavanên li gundê Peyanisê bertek nîşanî vê yekê dan û operasyon dane dest pê kirin.

**Gundiyek Peyanisê:** Komek kesên nenas bi rojan in li herêmê digerin Gundiyan, destnîşan kir ku li cihê ku teqîn çêbûyî bi dehan roj in komeke nenas bi awayekî serbest digerin û rastî tu mudaxaleya hêzên ewlehiyê yên dewletê nayên. Yek jî şahidê bûyerê da zanîn ku alavên leşkeriyê li cihê teqînê hebû û helîkoptera ku hatî bêyî ku tiştekê bike, vegeriye. Gundiyan û şahidên bûyerê balkişan ser Ergenekonê. Gundiyên Peyanisê dan zanîn ku dema referandumê de tu gundî neçûn ser sandoqan û beriya ku minubuse hatiye teqandin nezî 30 wesayît li vir derbas bûye. Gundiyekê, da zanîn ku yekemîn peywira dewletê ewlekariya welatiyan e û wiha domand: "Madem ku dewlet min û malbata min naparêze ez jî dê nivisa nasnameya ya TC jê bibim û Kurdistan binivîsim."

Gundiyê bi navê Osman Dayan jî wiha axivî: "Dema ku ez hatibûm cihê bûyerê min du mayinên antî tanq dîtin. Çanteyeke ku tê de qablo, pense, kêr û tel heyî me dît. Li ser çanteyê Tugaya Çiya û Komanda ya Colemêrgê nivîsandine. Gel ev çante desteser kir lê leşkeran gule berdan ser gel. Armanca wan ji holê rakirina delîlan e. Heke ku dewletê zanibû gerilayan kiriye dê bi helîkopteran ev çiyan bidana ber bombeyan. Lê ta niha tu operasyon pêk nehatiye. Sedema vê yekê çi ye gelo?"

## Êrîş li Stenbolê bi girseyî hat şermezarkirin

**STENBOL / DÎHA** - Bi sedan kesan li Stenbolê kuştina 10 welatiyên li gundê Peyanisê ya bi mayina leşkeriyê jiyana xwe ji dest dan şermezar kir.

Bi sedan endam û rêveberên saziyên sivîl û partiyên siyasî li Parka Fatma Girîk a semta Okmeydani ya navçeya Şîşliyê ya Stenbolê kom bûn û bi daxuyaniyekê teqîna mayina leşkerî ku li gundê Peyanisê bû sedema kuştina 10 welatiyan şermezar kir. Komê di daxuyaniyê de panqarta "Teqîna li Colemêrgê, bi destê dewletê ve pêk hatiye" vekirin û heta Ocaxa Tenduristiyê meşiyan. Komê di meşê de dirûşmeyên, "Dewleta kujer dê hesap bide", "Kurdistan dê ji faşîzmê re bibe goristan", "Gelê Colemêrgê ne bi tenê ye" berz kirin.

Li ser navê komê Husnu Çetîn daxuyanî xwend. Çetîn, destnîşan kir ku tiştên derketine holê diyar dike ku êrîş bi destê dewletê pêk hatiye. Çetîn, anî ziman ku dewlet hewl dide ku bi vî rengî gelê Colemêrgê yên di 12'ê îlonê de neçûn ser sindoqê ceza bike. Çetîn, da zanîn ku bûyer bi zanebûn hatiye plankirin û hewl didin bûyerê têxin stûyê PKK'ê û wiha got: "Lê plana wan ji aliyê welatiyan ve bi dîtina mayînên aîdî leşkeriyê vala derket. Lazim e dewlet vê yekê wekî şansek dawî bibîne û operasyonan rawestîne û ji bo çareseriya pirsgirêka kurd gavan bavêje. Lazim e hikûmet daxwazên gelê kurd ku bi neçûna ser sindoqan pergal boykot kir li ber çavan bigre."

### 'Li Stenbolê polîs êrîş kir'

Piştî daxuyaniyê komek ciwan bi dirûşmeyên dilsoziya bi Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan re tîne ziman qêriyan û bi konteynirên çopê rê li trafîkê girtin. Koma barîqat danîn û meşiya camên marketek mezin a li ser rê bi keviran şikandin. Ciwanên piştî mudexaleya polîsan li nava kuçeyan belav bûn, bersiv dan mudexaleya polîsan. Piştî kom belav bû olozî derketin û piştî demekê bi dawî bûn. Ancax hejmara polîsan her ku dem derbas bû zêde bûn û gef li girseyê xwarin.

# Dîsa agirbest û dîsa heman senaryo

**STENBOL** - Teqîna li gundê Peyanisê yê Colemêrgê pêk hat û bû sedema mirina 10 kesan, bûyera di sala 1996'an ya li Basa ya Şirnexê ya ku di minîbûsekê de 11 cerdevan hatin qetilkirin tîne bîra mirovan. Rojnameger Celal Başlangiç ê ku ji bo lêkolînan di sala 1996'an çûbû Basayê diyar kir ku ev êrîş wekî bûyera Basayê provokosyan e û wiha got: "Kengî siyaseta kurd jî bo çareseriyê hewldaneke cidî bike di nava dewletê de hêzên tarî provokasyonên wisa pêk tînin."

### 'Karê hêzên tarî ye'

Başlangiç, diyar kir ku berê jî dema ku siyaseta kurd û an jî BDP'ê ji bo çareseriyê daxwaza hevdîtina bi serokwezîr û serokomar re dikirin provokosyonên wiha pêk dihatin û wiha got: "KCD'ê û BDP'ê ji bo agirbest bidome hewldanên bi hikûmetê re hevîditinan bike, çêbûn. Di vê demê de ev provokasyon pêk hat. Di hemû agirbestan de provokosyonên wisa hene. Hêzên tarî dikevin dewreyê. Berya randuvaya Ahmet Turk a ku dê bi serokwezîr re pêk bîne provokasyoneke wisa hate kirin."

### 'Gelo heman senaryo ye?'

Hunermende Şanar Yurdatapan jî li ser bûyerê axivî û wiha got: "Dema ku min teqîn bîhist pirsa gelo provokasyoneke din e, hate hişên min. Heke wisa be çima dereng man. Dema ku mirov bûyerên Şemzînan û Basayê li hev tîne heman senaryo derdikeve holê."



### 'Hedef vîna gelê kurd e'

Seroka Giştî ya ESP'ê Fîgen Yuksekdag, diyar kir ku ev teqîn li Peyanisê cihê ku ji sedî 99 boykot derketiye pêk hat û ev yek li hemberî vîna gelê kurd bersivek e û wiha got: "Li heman herêmê berê li dijî gerîla pişt re jî li dijî sivîlan êrîşên kontra hatin kirin. Ev yek zihniyeta di şer de israr dike, radixe ber çavan. Êrîşeke wiha di pêvajoya bêçalaktiyê de pêk hat tê wateya ku dewlet pêvajoya agirbestê bi dawî bike û di nav hewldaneke wisa de ye. "

Yuksekdag, bang li Serokomar Abdullah Gul û Serokwezîr Tayîp Erdogan kir ku der barê kiryarên êrîşê de daxuyaniyê bidin kir û wiha pê de çû: "Duh Şemzînan îro Peyanis. Li dijî gelê Colemêrgê hewildanên komkujiyê tên kirin. Berê jî Fermandarê bêrê Buyukant ev kesên van karan dikin wekî 'zarokên baş' bi nav kiribûn. Ev yek konseptên şer yên di salên 90'an tîne bîra mirovan."



### 'Provokasyona Basayê'

Bûyera di sala 1996'an a li Navçeya Basa ya Şirnexê pêk hat agirbesta PKK'ê îlan kir bi dawî kiribû. Di bûyerê de 4 jê cerdevan 11 gundî hatibûn gulebarandin û pişt re jî şewitandibûn. Wezîrê Dewletê yê ber Pirsiyarê Mafên Mirovan û Parlamenterê Êlihê Adnan Ekmen diyar kir ku bûyer ji aliyê JÎTEM'ê ve hate kirin. Daxuyaniya piştî 13 sala hat wiha bû: "Komkujî PKK'ê nekir wê demê li herêmê sercerdevan ji me ra got. Lê wê demê em bêçare bûn û em di ser bûyerê de neçûn."

# Piştgiriya boykota dibistanan zêde dibe

Kampanyaya boykotkirina dibistanan ku ji aliyê TZPKurdî ve hate destpêkirin ji aliyê gelê kurd û saziyan ve rastî eleqeyê tê û piştgirî her diçe zêde dibe. Ji Amed û Mexmûrê banga ji bo piştgiriyê

**MEXMÛR / AMED** - Mamosteyên Wergeha Penaberan a Mexmûrê piştgirî dan boykota TZPKurdî. TUHAD-FED û DIYAR TUHAD-DER piştgirî dan biryara 'Boykot'ê. Rêveberê DIYAR TUHAD-DER'ê Mehmet Încîr diyar kir ku mafên kurdan yên bingehîn û pirsgirêka kurd tê pêşguhkirin û kurd tên înkarkirin.

Boykota dibistanên tirk a TZPKurdî ji her aliyan destek dibîne. Piştgiriyek jî ji mamosteyên wergeha penaberên Mexmûrê hat. Li ser navê Tevgera Perwerde û Hînkirina Zimanê Kurdî a Mexmûrê M. Nûrî Agît daxuyanê xwend. Di daxuyaniyê de dazanîn kû ew destek didin boykota TZPKurdî û waha got "Mêtîngehkarên Kurdistanê heta niha bi siyaseta bişavtinê sûcê mirovahiyê kirine. Li dijî ev sûca kî têkoşîn bide em destek dikin. Ev erkê hemû kurdan e. Dibe kurdî li her qada wekî zimanê jiyanê bikaranîn, dayîna pêşbirin û wek zimanê perwerdê bi kar anîn wekî xebatek şerefê ye. Em jî wekî Tevgera Perwerde û Hînkirina Zimanê Kurdî ya Mexmûrê amadane erka bikeve ser milê em ê pêkbînin. " Agît, komkujiya li Colemêrgê pêk hat jî şermezar kir û sersaxî ji gelê Colemêrgê û gelê kurd xwest.

**TUHAD-FED jî got 'Boykot'**

TUHAD-FED û DIYAR TUHAD-DER, li saziya TUHAD-FED'ê derbarê biryara TZPKurdî ya "boykota dibistanan" daxuyaniyek da. Daxuyanî Rêveberê DIYAR TUHAD-DER'ê Metin Încîr xwend. Încîr, anî ziman ku piştî 12'ê îlonê ronakbîr û demokratên qaşo di nîqaşanda dibêjin êdî Tirkiye rizgar bûye, demokrasi û azadi hatiye bi vê awayê pirsgirêkan paşguhdikin. Încîr da zanin ku mafê kurdan û perwerdehiya bi zimanê zikmakî ê ku mirovahiyê tê inkarkirin û bi zagonan tê astengkirin.

**Ziman qabûl nakin**

Încîr, destnîşan kir ku perwerdehiya zimanê zikmakî gelek girîng e û wiha got: "Zimanê zikmakî xwedî giringiyeke mezin e, her sal bi deh hezaran zarokên kurd dest bi dibistanê dikin û bi ferzkirina perwerdehiya zimanê tirkî rû bi rû dimînin. Kurdên ku di avakirina komarê de wekî hevparên bingehîn hatine pênaskirin, piştre jî hatin paşguhkirin û gelê kurd wekî 'welatiyên qaşo' hatine binavkirin. Ji ber vê yekê ziman, çand û nasnameya kurd hate inkarkirin. Heta ku ziman û çand di makezagonê den neyê parastin, ji tunebûnê xilasnabe." Încîr destnîşan kir ku ew wekî TUHAD-FED û DIYAR TUHAD-DER'ê piştgiriyê didin biryara TZPKurdî û bang li hemû derdorên demokratîk dikin piştgiriyê bidin vê biryarê.





# Erdogan jî dibistanên li Tirkiyeyê boykot kir

**WAN** - Hevserokê BDP'ê Selahattîn Demîrtaş, bersiva Serokwezîr Erdogan a têkildarî kampanyaya TZPKurdî ya "Boykota dibistanan" da û wiha got: "Serokwezîr berê ji ber azadiya baweriyê tune ye keça xwe ya bi turban dibistanên Tirkiyeyê boykot kir li Amerîkayê da xwendin. Niha Serokwezîr dibêje boykot sûc e."

Hevserokê BDP'ê Selahattîn Demîrtaş, ji bo ku lêkolînan têkildarî teqîna li Colemêrgê pêk hat û 10 kesî jiyana xwe ji dest da beriya ku biçe Colemêrgê, li Balafirgeha Wanê pirsên rojnamegeran bersivan. Demîrtaş, bersiva hikûmet û Serokwezîr a biryar TZPKurdî ya boykota dibistana da û wiha got: "Serokwezîr berê ji ber azadiya baweriyê tune ye keça xwe ya bi turban dibistanên Tirkiyeyê boykot kir li Amerîkayê da xwendin. Niha Serokwezîr dibêje boykot sûc e. Serokwezîr bi xwe gotibû 'Asîmîlasyon sûcê mirovahiyêye' Biryara boykot biryara TZPKurdî ye. Em partî jî piştgiriyê didinê. Ji bo ku perwerdehiya zimanê zikmakî em piştgiriyê didinê. Serê wan ji xwe serê sedema navîn e. Her sal bi milyonan zarokên kurdan di tezgahê asîmîlasyonê re derbas dikin. Serokwezîr keça xwe rêkire Amerîkayê. Ez rêkim ku derê. Li tu cihên din perwerdehiya kurdî tune ye em dê li welatê xwe vê yekê bikin."

# Girtî careke din 12'ê Îlonê dijîn

**EDENE** - Girtiyên di Girtîgeha Tîpa T a Osmaniyeyê bi riya name û malbatên xwe, diyar kirin ku pêkanînên li girtîgehê wekî pêkanînên 12'ê Îlonê ne û 2'yemîn car 12'ê Îlonê dijîn.

Girtîgeha Tîpa T a Osmaniyeyê ji roja vebû heta niha bi binpêkirina mafên mirovan ji rojevê dernakeve. Pêkutiyên li girtîgehê pêktên pêkutiyên darbeya leşkerî ya 12'ê Îlonê tîne bîra mirovan. Girtiyên di Girtîgeha Tîpa T a Osmaniyeyê de dimîn, bi riya rame û ziyaretên malbatên xwe diyar kirin ku di girtîgehê de pêkutiyên demên dawî wekî pêkutiyên 12'ê Îlonê ne. Bavê Murat Çetîn Abdurrezak Çetîn, diyar kir ku dema ji bo hevdîtina vekîrî çûye girtîgehê dît ku rewşa kurê wî nebaşe û ji jiyana wî bi guman e. Çetîn têkildarî mijarê de serî li ÎHD'a Edeneyê da.

Bav Çetîn, anî ziman ku kurê wî li Dîlokê rojnameyên Gunluk û Azadiya Welat belavdikir û wiha got: "Kurê min 7 meh berê li Dîlokê hate girtin. Piştî 5 mehan li Dîlokê ma 2 meh berê birin Girtîgeha Tîpa T a Osmaniyeyê. Dema ku jî Girtîgeha Dîlokê anîn hinek ji wan di tecrîtê de girtin û hinek jî bi rojan di hûceran de girtin. Rêveberiya Girtîgeha Osmaniyê bi pêkanînên xwe pêkutiyên darbeya 12'ê Îlona 1980'yan li ser girtiyan dimeşîne. Kurê min di girtîgehê de pêkutiyên 12'ê Îlonê dijî. Bi awayekî keyfî rojnameyan nadin wan. Nameyên ji malbat û saziyên mafên mirovan re tên şandin tên sansurkirin. Rêveberiya girtîgehê girtiyên bertekan nîşanî vê yekê didin rastî êrîşan pêktên."

**Rastî pêkutiya tên**

Çetîn, da zanîn ku kesên bertekan nişanî vê yekan didin dernaxin hewşên hevpar û wiha axivî: "Dema ku ez çûm hevdîtina vekîrî rewş gelek xirab bû. Rayedaran di 12'ê Îlonê de çawa zext û zordarî li girtiyan dikirin niha jî heman pêkûtî hene. Li Çukurovayê heyata ÎHD'ê li girtîgehê lêkolîn kir. Kurê min got ku 'piştî heyeta ÎHD'ê 15 rojan rewş baş bû lê disa pêkutiyan dest pêkir.' Niha rewşa wan qet baş nîn e. Dema ku min hevdîtin bi kurê xwe re çêkir rewşa wî qet baş nebû. Girtiyên bertekan nişanî vê yekê didin 3 mehan qedexekirina hevdîtinê û 3 meh ji mafê qadên wekhevî tên mehrûm kirin. Hêj ev ceza ji wan re teblîg nekirine. Lê dê rojên pêş me de bikarbînin. Em ji ber pêkutiyên li girtîgehê bi guman in. Em dixwazin rêveberiya girtîgehê dest ji van pêkutiyan berde."

Abdurrezak Çetîn xwest ku hemû sazî û kes di vê mijarê de bihestiyar bin û serî li Şaxa ÎHD'ê ya Edeneyê da. Rayedarên girtîgehê têkildarî îdiayan bersiv neda.



# Kesê ku êrîşî Akin Bîrdal kir hate girtin

**BURSA** - Kesê bi navê Bîlgehan Şimşek ku di mîtînga BDP'a Bursayê de êrîşî Akin Bîrdal kiribû hate girtin.

Roja cejnê ya duyem ku ji bo referandûmê li Bursayê mîtîngek ji aliyê BDP'ê ve hatibû lidar xistin, di mîtîngê de kesê bi navê Bîlgehan Şimşek derketibû ser dikê û êrîşî Akin Bîrdal kiribû bi hinceta " ji ber peywira karmend, bi qestî birîndarkirin", " din ava gel de tirs û xof afirandin" hate girtin. Şimşek di îfadeya xwe de anî zimên ku Têkiliya wî û rêxistinekê nîn e wî bi serê xwe ev êrîş kiriye, ji xwe fikiriye ku bike û li Bursayê ev yek kiriye.

# Mezinbûna aboriyê bi kêrî kê tê?

**ENQERE** - Li gorî daneyên Saziya Îstatîstîkê ya Tirkiyeyê (TUÎK) li gel ku ji sala 2002'yan ve aboriya Tirkiyeyê bi lez pêş ketiye jî dijberî vê yekê hejmara betalan derketiye 2 milyon û 751 kesan. Hîndekarê Zanîngeha Gazî ya Enqereyê Prof. Dr. Îşaya Uşur, diyar kir ku mezinbûyîna heyî, diçe torên fînansê û betaliya heyî jî encama kapîtalîzmê ye.

Hîndekarê Zankoya Zanîstiyên Îktîsadî û Îdarî ya Zanîngeha Gazî ya Enqereyê Prof. Dr. Îşaya Uşur, diyar kir ku mezinbûyîna heyî, diçe torên fînansê û betaliya heyî jî encama kapîtalîzmê ye. Uşur, bi lêv kir ku mezinbûyîna aboriya Tirkiyeyê girînge, lê asta mezinbûyînê di bin asta tê xwest de ye. Uşur, da zanîn ku aboriya Tirkiyeyê girêdayî serfkariya navxweyî û sermayeyê derve ye.

# Ji bo kurdî destûr tune, lê ji erebî re heye

**ENQERE** - Girtiyê bi navê Mehmet Nurî Ozenê di Girtîgeha Tîpa F a Boluyê de tê girtin, diyar kir ku di girtîgehê de destûrê didin pirtûkên îslamî yên erebî, lê destur nadin pirtûkên kurdî û wiha got: "Tu daxwazên me li ber çavan nayên girtin."

Girtiyê bi navê Mehmet Nurî Ozen ku di Girtîgeha Tîpa F a Boluyê tê girtin, bi nameyekê şert û mercên xwe ji DÎHA'yê re vegot. Ozen, di nameya xwe diyar kir ku piraniya rêveberên girtîgehê AKP'î ne û êrîşê li ber nirxên girtiyan yê manevî dikin.

Ozen, destnîşan kir ku ev demeke, nahêlin pirtûkên kurdî têkevin girtîgehê lê, pirtûkên olî yên erebî bi rehetî dikevin hundur. Ozen, da zanîn ku eger girtî biçin nimêjê mûameleyeke baş dibînin û bi lêv kir ku nimêji ji bo başkirina mercan wekî pîvan tê bikaranîn. Ozmen, got ku beriya îktîdara AKP hejmara personelên ku rojî digirtin gelek kêm bû lê piştî ku AKP bûye îktîdar hejmara personelên rojî digirin gelek zêde bûne. Ozen, bi lêv kir ku eger fedî nekin, dê bi darê zorê dersên olî bikin mecbûrî.

# Bersiva bêçalakîtiyê xwestin

Ji bo bêçalakîtî bi dawî bibe 2 roj man lê hê jî ji aliyê dewletê tu bersiv nehatiye dayîn. Li Mûşê saziyên sivîl ên civakî xwestin ku bersiva bêçalakîtiyê ku ji aliyê PKK'ê ve hatibû îlankirin bê dayîn



**MÛŞ** - 56 rêxistinên sivîl ên civakiyên li Mûşê, bi armanca pêvajoya bêçalakîtiyê dirêj bibe kom bûn û xwestin ku dewlet bersiva bêçalakîtiyê bide.

56 rêxistinên sivîl ên civakî yên Mûşê têkildarî bêçalakîtiya ku di 20'ê îlonê de bi dawî bibe li Odeya Pîşesaziyê û Bazirganiyê daxuyanî da çapemeniyê. Berdevka Demê ya KESK'ê Derya Yolcu daxuyanî xwend û diyar kir ku bûyera li Colemêrgê pêk hat provoksayon e û xwest ku hikûmet berpirsiyarên bûyerê zelal bike. Yolcu, anî ziman ku buyera li Colemêrgê diyar e ku ji aliyên hêzên tarî ve pêk hatiye û wiha got: "Ji bo ku bûyerên wisa pêkneyên divê hikûmet berpirsiyaran derxe holê." Yolcu, anî ziman ku ji bo bêçalakîtiya KCK'ê dirêj bibe divê hikûmet gav bavêje û wiha pê de çû: "Piştî daxwazên me di meha tîrmehê de deklere kirin li welatê me gelek pêşveçûnên berbiçav pêk hatin. KCK'ê li ser daxwaza derdorên bêçalakîtî dixwastin biryara bêçalaktiyê da. Di vê demê de hinek madeyên makezagonê hatin gurhetin."

**Bi ewlehiyê nayê çareserkiri**

Yolcu, da zanîn ku pirsgirêka kurd tenê pirsgirêk ewlehiyê nîn e û bi vê nayê çareserkirin û wiha axivî: "Qêrîna li ser cenazeyên leşkeran, lorikên dayîik û bavên kurdan, kesên di binçavan de hatin windakirin, bûyerên kiryar nediyar, valakirina gundan, girtina zarok, siyasetmedarên kurd û operasyonan nîşan da ku ev rêbaza çareseriyê nîn e." Yolcu, destnîşan kir ku divê hikûmeta AKP'ê hin wêrektir û bi înîsiyatîf be. Yolcu, xwest ku demildest operasyon bên rawestandin û bersiva bêçalakîtiyê bê dayîn.

# Dayikên Aştiyê dê li Taksîmê nobeta aştiyê bigirin

**STENBOL** - Înîsiyatîfa Dayikên Aştiyê, dê ji bo operasyonên ku ligel bêçalakîtiya KCK'ê tên kirin û hikumetê hişyar bike da ku muzakere dest pê bike li qada Taksîma Stenbolê îro 24 saetan "Nobeta Aştiyê" bigirin.

Înîsiyatîfa Dayikên Aştiyê ku zarok û xizmên xwe di şer de winda kirine, ji bo ku bang li hikumetê bikin û bibêjin çend roj maye ji bo 20'ê îlonê ku dema bêçalakîtiyê bi dawî dibe û hê jî dem heye ku ev yek dirêj bibe û ji bo çareseriyê pêngav werin avêtin ew ê li navenda Stenbolê li qada Taksîmê nobeta Aştiyê bigirin.

Dayik dê îro saet di 14:00'an de dest bi nobeta xwe bikin û ew ê 24 saetan li ber xwe bide nobeta wan. Û dayik wê van xwestekan ji hikumet û dewletê bikin: "Bila muzakere bi rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan û vîna kurdan BDP û DTK'ê re were destpêkirin. Bila 1500 siyasetmedarên kurd ên girtî di cî de werin berdan. Bila girtin û binçavkirin bi dawî bibe."

ÎHD'a Stenbolê dê piştgiriyê bide nobeta aştiyê û dê roja 18'ê mehê ji qada Taksîmê heta ber Lîseya Galatasarayê bi Dayikên Aştiyê re meşekê li dar bixin.

# Temîzoz di ser de jî ÎHD'ê sûcdar kir

**AMED** - Fermandarê Koma Berêya JÎTEM'ê Albay Cemal Temîzoz ku ji ber kuştinên kiryar nediyar yên sala 1993-95'an girtî tê darizandin, serokê ÎHD'a Amedê Muharem Erbey ku di danişînê de wekî şahid hate guhdarîkirin, sucdar kir. Her wiha parêzerên mudahîl jî diyar kirin ku dê der barê Temîzoz de gilî bikin. 18'emîn danişîna Fermandarê Koma JÎTEM'ê Albay Cemal Temîzoz û 7 bersûc ku di nava wan de sercerdevan Kamîl Atak jî hebû, li 6'emîn Dadgeha Cezaya Giran a Amedê hate dîtin. Besûc Albay Temîzoz, Kamîl Atak, Tamer Atak, Firat Altin, Hidir Altug, Adem Yakin, Kukel Atak, parêzerên wan û xizman jî tevli danişînê bûn.

Di danişînê de li ser îfadeyên Mehmet Nurî Bînzet, wekî şahid serokê ÎHD'ya Amedê Muharem Erbeyk ku ji doza KCK/TM yê girtibû hate guhdarî kirin.

Parêzerên bersûcan diyar kirin ku ku Erbey ji sûcê terorê hatiye girtin, îdia kirin ku şahidiya wî ne derbasdare.

Ligel vê parêzerên bersûcan dan zanîn ku bila şahidiya wî bê redkirin, ev heyeta dadgehê ev daxwaz qebûl nekir.

Muharem Erbey jî di danişînê de îdiayên Bînzet red kir û got ku hevdîtinên ku bi Bînzet re çêkiriye li ser daxwaza Bînzet çêkiriye. Her wiha Erbey da zanîn ku hevdîtina ku bi Bînzet re çêkirine, wekî ÎHD'ê her cureyê serlêdanê qebûl dikin.

Temîz jî di danişînê de mafê axaftinê girt û diyar kir ku ÎHD di bin bana KCK'ê de faliyetê xwe dimeşîne û got ku Erbey jî di vê serokatiya vê saziyê dike. Temîzoz wiha îdia kir: "Di çalakiyên PKK'ê de windahiyên sivîl çêdibin û ev jî rê li bertekên gel vedike. ÎHD jî berpirsên van windahiyan dewletê dibîne." Parêzerên Erbey li ser vê yekê diyar kirin ku dê der barê Temîzoz de gilî bikin.

# Ciwanên kurd naçin leşkeriyê

**STENBOL** - Tevgera Reda Wijdanî li Cîhanê yekem car bi ciwanê ku li Welatê Numidyayê tevlibûna artêşa Romayê redkir û hate darvekirin dest pêkir. Li Tirkiyeyê jî di pêvajoya şerê 30 salan de jî bandora xwe nîşan da. Komek ciwanên kurd ji ber pirsgirêka kurd bi slogana "Neçe leşkeriyê û xwîna birayê xwe nerjîne" amadekariyên daxuyaniya wijdana redî dikin.

Ciwanên kurd ji bo ku tevkariya şerê 30 sal in li Tirkiyeyê didome nekin amadekariya daxuyaniya reda wijdanî ya bi slogana "Neçe leşkeriyê û xwîna birayê xwe nerjîne" dikin. 15 ciwan, dê li ÎHD'a Stenbolê bi daxuyanîyekê ji raya giştî re biryara xwe aşkera bikin. Çavlêye ku daxuyaniya ciwanên kurd ên nebin hevkaren şer, eleqeyekî mezin bê nîşanadin. Tevgera Reda Wijdanî ya Kurd jî, diyar kir ku piştî daxuyaniyê ciwanên kurd ê bi girseyî serlêdanên reda wîjdanî bikin.




Li Tirkiyeyê yekemîn reda wijdanî Vedat Zencîr û Tayfun Gonu bi riya Rojnameya Guneş û Kovara Sokakê diyar kiribûn. Di sala 1993'yan de li Îzmîrê Atîla Kar û Yusuf Dogan rede wijdanî kirin. Di sala 1994'an de kesên tevli reda wijdanî bûn hejmara wan zêde bûn. Li ser vê zêdebûnê pergala artêşperest jî hemû derfetên xwe xistin dewreyê. Piştî li kanal HBB di bernameya Anten de bi Serokê SKD'ê Aytek Ozel û Redê Wîjdanî Menderes Meletlî hevpeyvîn kirin der barê Erhan Akyildiz ê bernaname amadekir û nûçegehan Alî Tevfîk Berber, bi fermana Fermandar Dogan Gureş hatin girtin û li Dadgeha Leşkerî hatin darizandin. Bi vê yêkê yekemîn car kesên sivîl li dadegehên leşkerî hatin darizadin. Girgîngiya vê dozê ew bû ku DGM'an biryar bêpewyirdarî da û di sala 1994'an de biryara kesên sivîl di dadgehên leşkerî da bên kirin hate dayîn

Di 15'ê gulana 2010'an de roja Reda Wijdanê ya Cîhanê de jî tevger mezin bû û bi girseyî daxuyanî tên dayîn. Di 15'ê gulana 2010'an de di nav de jin jî heye 29 kesan bi daxuyaniyekê rede wijdanî aşkera kirin. Her niha di nav de 24 jîn jî heyî 121 kesan reda wijdanî kir.

# Kadrî yê gerîlayê HPG'ê hate definkirin

**SÊRT** - Malbata gerîlayê HPG'ê Mahmut Kadrî (Rizgar Zagros) ku di operasyona li Çiyayê Çiravê de jiyana xwe ji dest dabû, ji ber ku nikarîbûn ji Îranê bê aliyê Tirkiyeyê, cenazeyê Kadrî yê HPG'î ji aliyê Şaredariya Sêrtê ve hate definkirin.

Cenazeyê gerîlayê HPG'ê Mahmut Kadrî (Rizgar Zagros) ku di 5'ê îlonê de di operasyona li Çiyayê Çiravê de jiyana xwe ji dest dabû hate definkirin. Malbata Kadrî ku 12 roj in cenazeyê wî li morga Nexweşxaneya Dewletê ya Sêrtê dihate girtin, ji ber ku Dewleta Îranê pasaport neda wan nikaribûn bên Tirkiyeyê. Ji ber malbat nekarîbû bê Tirkiyeyê cenazeyê Kadrî ji aliyê Şaredariya Sêrtê ve hate definkirin. Rayedarên şaredariyê cenaze ji morgê girtin û birin Goristana Şeyh Mûsa.

Li vir li gel ku polîsan nehiştiye jî bi sedan kes berhevbûn. Bi sedan kesên ku di nav de Endamê PM'ê yê BDP'ê Nezîr Gulcan, Cîgirê Serokê BDP'ê yê Sêrtê Alî Kayar, Cigirê Şaredar Musa Korhan û rêveberên BDP'ê jî heyî li gel sloganên "Şehîd namirin" cenaze defin kir. Polîs û tîmên taybet jî goristan dorpêç kirin. Piştî, definkirinê rêz hate girtin. Cîgirê Serokê BDP'a Sêrtê Alî Kayar, li gorîstanê axivî wiha got: "Ez xwe li ber şehîdên azadiyê birêzê xwe ditewînim. Em hêvî dikin ku Serokwez û Serokomar guh bidin dengê kurdan. Em êdî naxwazin gerîla an jî leşker jiyana xwe ji dest bidin." Piştî merasîmê girse ji bo sersaxiyê ber bi BDP'ê ve dest bi meşê kir.





# Parêzerên Ocalan çûn Îmraliyê

**BURSA** - Parêzerên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ku çarşema borî bi hinceta "Koster xerabe ye" nekarîbûn biçin Grava Îmraliyê", bi boneya bi muwekîlê xwe Ocalan re hevdîtinê pêk bînin ber bi Grava Îmraliyê ve bi rêketin.

Ji bo bi dawîbûna biryara bêçalakîtiyê ku ji aliyê PKK'ê ve hatibû dayîn 2 roj man û beriya bidawîbûna biryara bêçalakîtiyê parêzerên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ji bo bi muwekilê xwe re hevdîtinê pêk bînin çûn Îmraliyê. Parêzerên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan, Cengîz Çîçek, Mehdî Oztuzun, Sebahattîn Kaya, ku çarşema borî bi hinceta "Koster xerabe ye" nekarîbûn biçin Grava Îmraliyê serê sibê dîsa hatin navçeya Gemlîkê ya Bursayê. Parêzer serê sibê piştî di kontrola Fermandariya Cendirmeyan a Gemlîkê re derbas bûn ber bi Grava Îmraliyê ve birê ketin.

Wekî tê zanîn ku roja çarşemê parêzên Ocalan ji bo ku bi muvekilê xwe re hevdîtin pêk bînin serlêdan pêk anîbûn lê bi hinceta ku 'koster' xirab e parêzan bi Ocalan re hevdîtin pêk neanîbûn.

Di hefteya krîtîk de hevdîtina ku Ocalan bi parêzerên xwe re hedîtin pêk bîne ji nêz ve tê şopandin.

# Li Tetwanê greva birçîbûnê

**BEDLÎS** - Li navçeya Tetwana Bedlîsê 20 kes bi boneya ku bersiva bêçalakîtiya ku ji aliyê KCK'ê ve hatibû dayîn û bersiva biryara bêçalaktiyê bê dayîn ketin greva birçîbûnê. Kesên ku ketine grevê dê çalakiyê heta 20'ê îlonê bidomînin.

KCK'ê 13'ê tebaxê heta 20'ê îlonê biryara bêçalakîtiyê girt. Li cihê ku dewlet bersiva bêçalakîtiyê bide operasyon zêdetir kir û gelek gerîlayên HPG'ê jiyana xwe ji dest da. Li navçeya Tetwana Bedlîsê ji bo ku dewlet bersiva biryara bêçalakîtiyê bidin bi beşdariya 20 kesan greva birçîbûnê hat destpê kirin. Greva birçîbûnê ji aliyê BDP'a Tetwanê hat destpêkirin û li pêşiya Navenda Kar aYaşamê kon hate vedan.

www.arsivakurd.org

# CHAK'ê Tirkiye gilî kir

Piştî li Zanîngeha Hamburgê hat tespîtkirin ku Artêşa Tirk çekên kîmyewî li dijî gerîlayên PKK'ê bikar aniye her roj geşedanek pêk tê. Herî dawî CHAK'ê di Dadgeha Cezayê ya Navneteweyî de Tirkiye gilî kir

AMSTERDAM / ANF – Navenda Mexdûrên Helepçeyê (CHAK) bo ku Tirkiyeyê li dijî gerîlayên PKK'ê çek bikar aniye giliya wê di Dadgeha Cezayê ya Navneteweyî de kir.

Der barê mijarê de rojnameya Rudaw a flamanî di weşanê de agahî da. Di agahiyê de diyar kir ku CHAK'ê di Dadgeha Cezayê ya Navneyeweyî de li ser Tirkiyeyê bo ku li dijî gerîlayên PKK'ê çekên kîmyewî yên li gorî hiqûqa navneteweyî sûc in bikar aniyê sêrlêdana sûc kir û xwest doz lê bê vekirin. Di serlêdanê de wêne û dîmenên ku bikaranîna çekan tespît dikin jî dan dadgehê. CHAK'ê aşkera kir ku wan ji bo serlêdana sûc ji rayagiştî ya cîhanê piştgirî girtine.

Endamê Lijneya Navendî ya CHAK'ê ya Hollandayê Elî Mehmûd got ku Artêşa Tirk hemû rêgezên esasî yên mafên mirovan û hiqûqa şer ya navneteweyi binpêk kiriye û li dijî gerîlayên PKK'ê çekên kîmyewî bikar aniye û di encama bikaranîna van çekên kîmyewî de gelek gerîla jiyana xwe ji dest dane û gelek jî birîndar bûne.

Mehmûd destnîşan kir ku Dadgeha Cezayê ya Navneteweyî serlêdana wan a sûc pir cidî girtiye. Hat vegotin ku wan ji şewirmendê dadgehê û dadgerên dadgehê re diyar kirine ku artêşa Tirk bi boneya parastina dewletê ne xwedî maf e ku hiqûqa şer ya navneteweyî binpê bike. Ji şêwirmen û dadger hatiye xwestin ku der barê mijarê de lêkolîn bê kirin. Li gorî agahiyê şêwirmen û dedgerên dadgehê guh dane û gotine ew de bi cidî mijarê bişopînî. Di rojên borî de di çapameniya Almanyayê de agahiyên bikaranîna çekêm kîmyewî ya li dijî gerîlayan cih girt û gelek deng veda. Hat gotin ku Artêşa Tirk li dijî gerîlayên PKK'ê çekên kîmyewî bikar aniye.


Dihat gotin ku di meha îlona 2009'an de 8 gerîla li Çelê di êrişa artêşa Tirk ya kîmyewîde jiyana xwe ji dest dane. Zanîngeha Hamburgê ya Almanyayê li ser wêneyên di wî êrişêde bi kîmyasalê hatibûn qetilkirin dişopîne û tespît dike ku gerîla bi kîmyasalê hatine qetilkiri.

Partiyên siyasî yên Almanyê û parlamenteran li ser mijarê ji Tirkiyeyê daxuyanî xwestin. Diyar kirin ku heke Tirkiye li ser mijarê daxuyanî nede dê ew jî mijarê bibin Dadgeha Cezaya Navneteweyî.

# Di nav YE û Fransyayê de aloziya li ser romenan

PARÎS - Li Brukselê civîna herî aloz a Yekitiya Ewropayê (YE) hat jiyîn. Di navenda aloziyê ed polîtîka Fransayê ya li ser romenan hebû.

Aloziya ji ber polîtîkayên Fransayê yên derbarê polîtîka dersînorkirina romenan ji meha tîrmehê ve destpê kiriye. Di meha tîrmehê de ev biryar hatiye girtin. Di rayagiştî ya Fransayê û di navneteweyîde piştgiriyeke mezin ji bo romenan hat dayîn. Herî dawî helwesta Fransayê ya li dijî romenna di civîna YE'yê de jî bû sedemê aloziyê. Serokên welatên YE'yê yên hevkar di civînê de xwe di nav pevçûnekî navxweyî de dîtin.


Nikolas Sarkozy

Di civînê de aliyên Serokomarê Fransayê Nîcolas Sarkozy û Serokê Komîsyona YE'ê Jose Manuel Barroso lihev gij bûn û beziyan hev. Barroso berya ku civîn dest pê bike poîtîkayên Sarkozy yên Fransayê, bi tûndî rexne kir û şibhand polîtîka Naziyan ya Dema Şerê Duyemîn yê Cîhanê. Civîn jî di rewşeke dîplomatik de pêk hat. Di nava Sarkozy û Barroso de nîqaşeke tund derket.

Sarkozy pir bi hêrs piştî civînê derket pêşberî çapameniyê. Sarkozy got ku di nav hevkaran de axaftinên wisa naye kirin. Sarkozy da zanîn ku daxuyaniyên hatine dayîn wî pir êşandine. Sarkozy vegot ku peywira min ev e ku Fransayê biparêzim.

Sarkozy di daxuyaniyê de li pişt polîtîkayên xwe yên nijadperest rawestiya. Diar kir ku ev polîtîka ne mafê hikûmeta Fransayê ye peywira wan e û ew jî vê peywirê pêk tînin.

Barroso jî paşve gav neavit. Diyar kir ku ew dê di derbarê hikûmeta Parîsê de pêvajoya qanûnî bide destpêkirin. Barroso vegot ku komîsyon parazvanê peymanan e û ew jî dê vê peywirê pêk bînin. Barroso destnîşan kir ku ew dê destûr nedin li Ewropayê zext li kêmaran bê kirin û cihêkariya etnîkî bê meşandin. Baroso da zanîn ku rûmeta însan mijareke pîroz e û ew dê nehêlin kes dest bide vê nirxê.

Pêşî girtina vê aloziya ku li civîna bilin ya YE'yê hat jiyîn ket stuyê Serok Herman Van Rompuy. Van Rompuy bibîr xist ku têkiliyên nav saziyên yekîtiyê û welatên endamên YE'yê li ser hîma rêzdariyê tê meşandin. Xwest her alî ji vê pîvanê dernekeve der.

Guman ev e ku ev aloziya nav endamê YE'yê de reketine holê hê bidome û bigihîje hin netîceyên din. Şîroveya herî balkêş jî ji Serokwezîrê Luksemburgê Jean Claude Juncker hat. Juncker got ku nîqaşên nav Sarkozy û Barroso wek nîqaşeke asta wê ya "testosteronê" zêdeye binav kir.

# Israîl ji DYA'yê 20 heb balafirên şer dikire

QUDS - Hikûmeta Israîlê biryar da ku ji Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê (DYA) 20 heb balafirên şer ên bi dilqê F-35 bikire.

Serokwezîrê Israîlê Binyamîn Netanyahu diyar kir kir ku kirîna balafirên şer yên herî pêşketî pêngeveke xurte û dê hêza artêşa Israîlê mezin bike.

Israîl ji 20 balafirên şer ên F-35 bikire dê 2,7 milyar dolar bide. Serokwezîrê Parastinê yê Israîlê Ehud Barak di prensîbê de mehek berê ji bo kirîna van balafiran biryar dabû. Sedemê derengmayîna mohrkirina peymanê ne tenê bihayê balfiran bû. Entegra van balafiran ya ji bo pergala Israîlê jî ji bo Israîlê serêşek bû. Heta ev hatin çareserkirin dem derbas bû. Israîlê dixwest 75 balafirê F-35 bikire ancax ji ber hin tengasiyên mijara gotinê bi kirîna 20 balafiran razî bû.

Balafira destpêkê ya f-35 herî zû dê di sala 2015'an bikeve destê artêşa Israîlê. Ancax Israîl dê pîlotên xwe berya vê li DYA'yê perwerde bike.

Balafirên şer yên F-35 di roja îro de balafirên herî pêşketî yê şer in. Ev balafir bi tîkanî ya serberjêr û serberjor kare bifire. Her wiha van balafiran bi teknolojiya xwe ya xeyalet karin xwe ji radaran veşêrin.

# Li Afganistanê 18 kes hatin revandin

QABÎL - Li Afganistanê berya ku hilbijartin pêk bê 10 kesên piştgirî didan berendamekî û 8 kesên ku di organîzasyona hilbijartinê de dixebitin û li herêma Mugur ya li eyaleta Badghîsê 18 kes hatine revandin. Serokê Komîsyona Hilbijartinan Abdul Rahman diyar kir ku ji ber revandina van 18 kesan Talîbanê berpirs e.

Waliyê Mugurê Mihemed Şah Hanzala jî bûerê piştrast kir û got kesên hatine revandin birine Bala Mughabê ku di bin kontrola Talîbanê de ye. Roja 16'ê îlonê ji aliyê Talîbanê ve daxuyanî hat dayîn û di daxuyaniyê de hat aşkerakirin ku ew hilbijartinê boykot dikin û li dijî dargirkerên biyanî banga gurkirina şer kiribû.

Li Afganistanê ji sala 2001'ê ve ku desthilatdariya Talîbanê têk çû û şûn ve duyemîn care ku hilbijartina giştî ya parlamentoyê pêk tê. Talibanê roja 5'îlonê jî berendamên parlamenteriyê hişyar kiribû.

Hêzên biyanî bi fikar in ku banga Talîbanê pir bi bandor derbas bibe. Gelê afganî ji ber êrişên leşkerên NATO'yê û kuştina sevîlan pir bêzar bûne.

# Li Meksîkayê di şerekî de 41 kes mirin

MEKSÎKO – Li Meksîkayê di nav leşker û şebekeyên narkotîkê de şer qewimîn û di şerî de 41 kes hatin kuştin. Agahî di medya Meksîkayê de hat dayin. Tê gotin ku li eyaleta Tamaulîpasê di çewlîkek de li ser hewldanên bi guman leşkaran bi ser çewlîkê re girtine û şer qewimiyê di vê şerî de 22 kes ji şebekeyên narkotîkê hatiye kuştin û leşkerek jî birîndar bûye. Hat diyarkirin ku ev şer 2 saet dom kiriye. Piştî şerî 25 çekê mezin, narincok û hin alavên din yên leşkerî hatine girtin. Rojek berya vê jî li eyaleta Nuevo Leonê şerekî din jî qewimîbûn Di wî şerî de jî 19 kesên çekdar hatibûn kuştin. Serokdewletê Meksîkayê Felîpe Calderon di sala 2006'an de bû desthilatdar û ji wê demê û şûn ve di operasyonan de bi kêmanî 28 hezar kes hatine kuştin.

# Li Moskowê li dijî mafyaya kurd sûîqest

MOSKOW / ANF - Li dij Serkêşê Mafyayê yê li Rûsyayê Dad Hasanê bi navê xwe yê rastîn Aslan Reşîdovîç Ûsoyan li Kolana Tverskaya ya Moskowê sûîqest pêk hat.

Ajansên Rûsyayê wekî nûçeya flaş ragihand ku pêr êvarî li kolana herî qelebalix a Moskowê li Tverskayayê sûîkast li dijî Ûsoyan pêk hatiye û jiyana xwe ji dest daye.

Paşê televîzyonên rûs ragihandin ku Ûsoyan û parazvanê ku wî diparast v re rakirine nexweşxaneyê û hê jî tedawî dibe. Piştî bûyerê dozgerê giştî yê Rûsyayê gotin ku wan lêpirsîna teşebusa cinayetê dane destpêkirin.

Li gor agahiyên ku hatine bi dest xistin Ûsoyan û parazvanê wî li kolanê ji aliyê sekmanekî (sniper) ve bûye hedef û derb lê ketiye.

Polîs diyar kir ku guleya li Ûsoyan ketiye ji çeka nîşangereke tûj ku demek berê Yaponçîk kuştibûn derketiye. Yaponçîk jî li Rûsyayê di nav lîderên mafyayê de cih digirt û navê xwe yê rastîn Vyaçaslev Îvankov e.

**Ûsoyan serkêşê mafyayê bû**

Dad Hasan di sala 1937'an de li Tiflîsê ji dê û bavekî kurd hatiye dinyayê. Tê destnîşankirin ku bi taybetî di warê kontrolkirina qumar, esrar-eroîn û hwd û çavkaniyên xwezayî de gelekî bi bandor e. Ûsoyan kurdekî êzîdîbû û wekî serokê mafyayê yê ku li Rûsya û Qefqasya û gelek welatên biyan dihat nasîn. Her wiha bandora xwe gelekî bûn.

# Israîlê lîderekî Hamas ê yê leşkerî kuşt

GAZZE - Li Şerîaya Rojava ya Filistînê leşkerên Israîlê li dijî fermandarekî leşkerî yî Hamasê êrîş pêk anî û di encama êrîşê de fermandarê leşkerî yê Hamasê hat kuştin.

Ji ber ku bûyer di vê dema hevdîtina Filistîn û Israîlê de pêk hat balê kişand. Dixuye ku Israîl ranaweste û di pêvajoyeke wisa de jî jî operasyon êrîşan pêk tîne. Herî dawî li dijî fermanderekî Hamasê Îyad Ebuu Şilbaya (38) di kampa penaberan ya Nur Şamsê ya nêzî bajarê Tulkerema bakûrê Şerîaya Rojava êrîş pêk hat û hat kuştin.

# Li Japonyayê hikûmet bi giştî îstifa kir

TOKYO – Li Japonyayê ji ber ku Serokwezîr Naoto Kan xwest di desteya wezîran de guherîn çêke hikûmetê bi giştî îstîfa kir. Der barê mijarê de Wezîrê Dadê Keîko Chîba û Wezîrê ji reforman berpirs Bakan Renho daxuyanî da çapameniyê û di daxuyaniyê de diyar kirin ku desteya wezîran bi giştî îstîfa kiriye. Hat diyarkirin ku desteya wezîran ya Japonyayê ji nû ve dê bi giştî bê diyarkirin.

www.arsivakurdi.org

# Jin li dijî operasyonan amadekariyê dikin

Meclisa Jinan a BDP'ê bi armanca ku pêşî li operasyonan bigirin û pêvajoyeke din a şer û mirinan nejîn ketin nav hewldanan. Endama Meclisa Jinan a BDP'ê Asiye Kolçak diyar kir ku ji bo pêşî li opersayonan bê girtin ew ê her tîştî bikin

**STENBOL / DÎHA** - Endama Meclisa Jinan a BDP'a Stenbolê Asiye Kolçak, bang li hemû kesan kir û xwest tevli çalakiya rûniştê ya "Operasyon û kuştinan rawestînin bersiva agirbestê bidin" bibin û wiha got: "Em naxwazin careke din pêvajoyeke bixwîn, kuştin û bi rondik bijîn. Ji ber vê yekê em bang li hemû kesên demokrat û derdorên aştîxwaz dikin ku ji bo aştiyê dengê xwe bilind bikin."

Jin ji bo rawestandina operasyonan û dirêjkirina pêvajoya bêçalakiyê her wiha bi boneya dewlet bersîvê bide biryara bêçalakiyê ketin nava liv û tevgerê. Meclisa Jinan a BDP'ê ya Stenbolê dê di 18'ê îlonê li Qada Taksîmê bi navê "Operasyonan û kuştinan rawestînin bersiva agirbestê bidin" 3 saetan çalakiya rûniştê li dar bixin. Endama Meclisa Jinan a BDP'ê ya Stenbolê Asiye Kolçak, ji her kesî xwest ku tevli meşê bibin û piştgiriyê bidin çalakiya aştiyê. Kolçak, bal kişand ser bêçalakîtiya KCK'ê ya û xwest berî ev pêvajo bi dawî bibe dewlet bersîvê bide. Kolçak, anî ziman ku di şerê 30 salan de bi hezaran ciwanan jiyana xwe ji dest dane û wiha axivî: "Tevgera Azadiya Kurd ji bo pirsgirêka kurd bi awayekî demokratîk û riyên diyalogê bên çareserkirin nexweşeya ya riyê daniye holê. Em ji bo jinên tirk û kurd rondikan nerêjin careke din bang dikin. Banga me ji bo hemû wijdana hemû gelên Tirkiyeyê dijîn e. Banga me ji bo kesên alîgirên aştiyê, rewşenbîr û jinên kurd û tirk e."

**'Êşan dike amûra siyasî'**

Kolçak, da zanîn ku êdî divê hemû jin ji bo aştiyê dengê xwe bikin yek û dê bi slogana "Em ji mirinên leşker û gerilayan re bêjin bes e" dê vî şerî bidin rawestandin û wiha pê de çû: "Em wekî jinên kurd li gel hemû êşên me jiyîn dixwazin bi gelên Tirkyeyê re bijîn û di vê yekê de israr dikin. Serokwezîr di mitîgên xwe de behsa ciwanên kurd ên di Girtîgeha Amedê de rastî îşkenceyan hatin dike û êşên me dike amûrekî siyaseta xwe ya qirêj. Lê bi salane jinên kurd van êşan diqîrin. Lê hemû rayedarên dewletê û hikûmeta AKP'ê 8 sal in dengê me nabihîse"

**'Em mirinan naxwazin'**

Kolçak, destnîşan kir ku piştî biryara KCK'ê ya bêçalakiyê operasyonên dewletê zêdebûne û wiha dirêjî li axaftina xwe kir: "Mixabin ji wê rojê heta niha 20 gerîlayan jiyana xwe ji dest dane. Ji ber vê yekê em bang li hemû jinan dikin ku tevlî çalakiyên me bibin." Kolçak, ji bo êşên jinên kurd û tirk bi dawî bibin û şer xilas bibe bang li hemû derdorên bihestyar kirin ku tevlî çalakiya wan bibin û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Em dê 3 saetan çalakiya rûniştinê ya bêdeng bikin. Heke rayedar heta 20'ê îlonê gavek erenî neavêjin dê pêvajoya bêçalaktiyê bi dawî bibe. Em naxwazin pêvajoyeke din ya mirina bijîn. Ji ber vê banga me bo hemû derdorên bihestiyar heye ku tevlî çalakiya me bibin."



## Ji jinên KESK'ê piştgiriya ji bo Aştiyanî

**ÎZMÎR**- Platforma Jinan a KESK'ê ya Îzmîrê, bi armaca ku piştgiriyê bidin Sakîne Aştiyanî ya ku bi cezayê darvekirinê tê darizandin, îmze berhevkirin û dê bişînin Balyozxaneya Îranê.

Endamên Platforma Jinan a KESK'ê ya Îzmîrê, wesîleya ku piştgiriyê bidin jina bi navê Sakîne Aştiyanî ku cezayê recmê ji bo wê vegerandibûn cezayê darvekirinê, li Egîtîm Sen'a Îzmîrê daxuyaniyek dan çapemeniyê. Endama platformê Zehra Şavaş Tinar li ser navê jinan daxuyanî xwend û diyar kir ku rejîma Îranê pêkutiyên xwe yên derveyî mirovahiyê bê navber didomîne û her wiha destnîşan kir ku li Îranê bi hezaran jin ji bo ku xwe baş napêçin rastî cezayên hişyariyê tên. Şavaş wiha dirêjî da axaftina xwe: "Li Îranê ji ber daxwaza zayendî bi hezan kes ya nasnameya xwe vedişêrin an jî welatê xwe neçar dimînin ku terk bikin. Dewleta Îranê ji ber ku rolê mêr yên serdest nayê bicih, kesan wekî ku Tirkiye dike bi kuştinê ceza dikin. Hemû kesên ku muhalîfên rejîma Îranêne bi cezayê darvekirinê tên cezakirin. Di 30 salê dawî de 2 hezar jin, 107 hevjîn hatin darvekirin. Em di vê baweriyê de ne ku em dê bi hêza xwe pêşî li van cînayetan bigirin. Rakirina cezaya Sakîne di destê me de ye. Em wekî jinên rêxistinkirî di qadê de dikarin têbikoşin."

Endamên platformê, îmzeyên ku ji bo Sakîne Aşîtiyanî berhev kiribûn dê ji Postaxaneya Konê bişînin Balyozxaneya Îranê.

## Jinên kerkûkî li dijî şîdetê kampanya da destpêkirin

Abdullah REMEZAN/ HEWLÊR-DÎHA

Li Kerkûkê 14 rêxistin û saziyên sivîl ên jinan, li hemberî şîdet û destdirêjiya jinan, kapmanyaya 'Ji çandaa destdirêjiyê re na' bi daxuyaniyek çapemeniyê dan destpêkirin.

Li Herêma Kurdistan pêkutî û zêdebûna şîdeta li dijî jinan bidawî nabin. Li hember zêdebûna şîdetê, li salona Xakê ya Kerkûkê 14 rêxistin û saziyên sivîl ên jinan, kapmanya ' Ji çanda destdirêjiyê re na' bi civînek çapmenî aşkera kir. Tamîn Mihemedemîn daxuyanî xwend. Mihemedemîn, diyar di warên siyasî, leşkerî, civakî, aborî, zagonî û dahurînerî de destdirêjiya li dijî jinan didome. Mihemedemîn, ev yek wekî derûniya, şîdeta cesteyî lêdan, lêxistin û zayendî berdewam dike nirxand.

**Ji bo pêşî lê bigrin kampanya**

Mihemedemîn da zanîn ku destdirêjiya li dijî zayend û jinan didome û bi armanca dawî li vê çand û hewldanê bînin dest bi vê kampanyayê kirine. Mihemedemîn derbirî ku niha qeydên fihûşê jî peydabûne û wiha axivî: "Em ji bo vê yekê dest bi vê kampanyayê kirine."

Endama desteya rêvber a Rêxistina Jinên Azadîxwaza Kurdistanê (RJAK) Şikofe Reşîd jî bal kişand ser armanca kampanyayê û wiha got: " Em komek rêxistinên jinan hatin cem hev. Me biryar girt li dijî şîdeta li dijî jinan tê meşandin hatin cem hev. Di encamê civînê de gihiştin vê astê ku dest bi kapmanyaya 'Ji çanda destdirêjiyê re na' bikin." Ji Yekitiya Jinan a Kurdistanê Gulistan jî anî ziman ku ew wek rêxistinên jinan ku xebatên xwe li Kerkûkê dimeşînin û ji bo her alîkariyeke jinan amade ne.

**Li Kerkûkê şîdet zêde dibe**

Ji Komeleya Hîwa ya Iraqî Sirûd Mihemed jî wiha axivî: "Ji ber ku şideta li dijî jinan li Kerkûkê pir zêde ye me dest bi vê kampanyayê kir. Ji rêxistina Sentera Çalakiya Jinan Taniya Mihemedemîn wiha axivî: " Rewşa jinan li Kerkûkê wekî beşek ji civaka herêmê rastî şîdetê tên." Kampanya dê di rojên pêş de li Silêmaniyê jî bi daxuyanîyekê bê aşkerakirin.



## Ax û Jin

Jin destê xwe da axê. Ji axê cêrên mezin çêkir. Ax simbilên genim da û bi vê yekê destê xwe da jinê. Jin, di cêran de parast berhemên yekem ê ked û hezkirina xwe. Berhemên di van cêran de hatin komkirin ne ji bo berjewendiyê bûn, tenê ji bo dayîn û parvekirina mirovahiyê bûn. Cêr tijî bûn. Her ku tijî bûn, diz jî zêde bûn. Dema diz zêde bûn, cêr hatin şikestin. Her çend şikestîbin jî yên di cêran de zêde dibin dewam dikin. Yê cêr şikandine êrîşî axê jî dike. Jin û ax dişibin hev. Perdeya bêdengiyê dixin navbera jin û erdê. Erd dilşikestî û xeyidî ye, ji bo jî dîrokê tola xwe hilde, li benda wê roja ku êdî ji ber van xirabiyan bibe kevir e.

Niha ev cihên ku jiyan jî nû ve zindî dibe, hesreta jin, bihar û axê ye. Dayika cîhanê ya pîr û hemû mirovahî hesreta hevdîtina nû ya bihar, jin û erdê ne. Ji bo jiyana ziwa bûye baran û av, ji bo jinê jî kêfxweşî pêwîst e. Ya ku hesretê bi dawî bike û dawî li ziwabûnê bîne jî baran e, çemê ku ji dilê jinê biherike… Her ku ruhê me bi rojê re ronî dibe, em bi xwe tevlî bihar û erdê dikin û bi wan re dibin yek. Îsal coşa me ji her salê cudatir e. Her çiqas riyên dirêj, çiya û derya bikevin navberê jî, em ji her demê zêdetir nêzî Serok APO ne û em bi kêfxweşî û biryardariya ku di ronahiya Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk de xwe paqij bikin, biharê pêşwazî dikin. Em dizanin ku çiqas em xwe nû bikin, em ê wateya bidin vê têgehê ewqas pîroz bikin. Têgeh zindî ne. Ew wateya jiyanê û têkoşînê ne, li gorî pêşketina însan jidayîk dibin, mezin dibin û dema neyên bikaranîn dimirin. Bi vî rengî aliyê kêm, lê ewqas jî bingehîn ên têkoşînên azadiyê ku ji herikîna dîrokê heta îro tê temam kir. Têkoşîna azadiya jinê ji hegemonyaya îdeolojiyê ya pergala desthilatdar rizgar kir û hişt ku xwe bigihîne nasnameyekê. Rastiya Serok APO di heman demê de azadî û nasnameya vê bi xwe ye. Di vê rastiyê de azadiya jinê ne tenê ji bo zayendekê ye, êdî bûye malê rizgariya hemû mirovahiyê. Tevî ku jin xwediyê rehên bingehîn ê dara şaristaniyê bû, berî şîn bibe ev dar hatiye kesixandin, şitlên wê şikandine û nehiştine mezin bibe. Manîfesto û perspektîfên çareseriyê yên tê de derketine holê, di dewsa tedbîrên rojane de, pêdiviya ku em bi zayendî û afirînêriya jinê rehên şaristaniyê ji nû ve bi hêz bikin û vê dara şaristaniyê ji nû ve şîn bikin destnîşan dike. Serok APO bi manîfestoyê, ji roja ku jin li axê guhdar kiriye, cêr çêkirine û heta îro hemû qonaxên şaristaniyê tawaf kirine, ji bo jin mabeda ku wenda kiriye ji nû ve saz bike, derfet daye û mirovahî ji nû ve teslîmî destê jinê yê kedkar kiriye.

Bi bikaranîna aliyên xweser ên xwezaya jinê careke din dixwaze jinê biavêje bîrên tarî yê dîrokê û bi vê yekê lîstoka xwe ya dizîtiyê didomîne. Jin dikare bersîva herî bi hêz bide demokrasiyê, lê tevî vê yekê ger xwe bê hêz û bê amadekarî bihêle, ev tê wateya ku di serî de têkçûne qebûl bike. Ji ber jin kilîda paşerojê û xala serekê ye, yê wenda bike jî wê ne tenê jin, xweza, însan û tevahî cîhan be. Îro ji her demê zêdetir divê aliyên li derveyî jiyanê mane, werin bihêzkirin, hêstên jinê ji dogmayan werin rizgarkirin û zelalkirin. Pêwîste em bi têgihiştineke berfireh û yekgirtî nêzî têkoşînê bibin. Divê ji bo her tiştên ku sîstema desthilatdar cihê û yên din dibîne, ji bo pirsgirêkên weke hawîrdor, çîn, netew û jiyana civakî re bersîvên me yên berfireh hebin.

Berî her tiştî jî ji bo civakek li ser bingeh û nirxên rast pêşbikeve, divê em perwerdekirina nifşên nû hedef bigrin û em bihêlin mêr bigihe wê zanebûnê ku ew ji jinê zêdetir ji xwe dûr ketiye û divê xwe nas bike. Ji bo em vê pêk bînin qadên me yên têkoşînê ji her demê zêdetir mezintir û berfirehtir in. Em dikarin tenê bi vê yekê xwe bigihînin peymana civakeke nû û her aliyên jiyanê ku em bi hesreta wê mane…

PELŞÎN KOÇER

www.arsivakurdi.org

# Pêşketina Neteweyî...

**Ji bo neteweyan modela herî kêrhatî modela neteweya demokratîk e. Pir girîng e ku mirov fêhm bike, di mijara netewe de civaka demokratîk di warê çareserkirinê de ew civak e ku dikare vê modelê bi pêş de bibe**

ABDULLAH OCALAN*

Wexta ku civak wekî civaka komîn a destpêkê, civaka dewletê û civaka demokratîk di nava xwe de tê dabeşkirin, ev bi pirsgirêkên rêveberî û çînîbûnê re têkildar e. Dabeşbûna di çarçoveya rastiya neteweyî de zêdetir bi bûyerên siyasî, hiqûqî, çandî û ziman diyar dibe. Ne bi tenê şêweyekî netewe, mirov dikare behsa şêweyê gelek neteweyan bike û ev manedartir e. Ne neteweyên li ser heman hîmî avakirî, lê belê mumkin e ku mirov behsa yên li ser hîmên gelekî ji hev cihê avabûne, bike.

Em wexta hewl bidin maneyê bidin kategoriya neteweyê, diyardeyeke giştî ya civakî heye ku divê mirov timî li ber çav bigire. Dema em wê li ber çav bigirin em ê karibin jê gelekî hîn bibin. Di serî de klan bi tevahî komên mirovan pirsgirêka wan a 'ew bibin ew' heye. Ango ez civakek an jî komeke çawa me? Fena ku nasnameya xwe dixe ber lêpirsînê. Çawa ku her mirovek navek û pênasekî xwe heye, ji bo civak an jî koman meseleya nav û nasnameyan jî ji pêdiviyekê wêdetir mecbûriyet e. Bi qasî ku di çavên mirov re biçin, li naverastê gelek civakên bi xisletên cihê hene, ji lewra pir xwezayî ye ku wê xwe îfade bikin û xwediyê nasnameyê bin. Naxwe dê bibin mîna endamên malekê yên nav û nasnameyên hev nizanin û bi vî awayî hewl bidin têkiliyê deynin. Jixwe mirov şêweyekî bi vî rengî nikare ji bo civaka klan jî bifikire. Bi hêsanî kesek ji yê-ya din re bêje 'were' ev yek bê navhildan nabe. Jixwe gelek xisletên xweser û cihê yên civakan hene, bê navhildana wan û bê navlêkirinê, têkilîdanîn, ketina nav zanîn û çalakiya civakê, tewş e ku mirov behsa pêşketinê bike. Di rewşeke welê de civakeke bê ziman tê hişê mirov ku ev yek li cem heywanan jî nîn e. Zimanê wan jî yê sembolan heye. Pirr ziman, pirr çand, pirr siyaset û pirr huqûq mumkin in. Lê di nava tevna van têkiliyan hemûyan de jî nav û nasname şert e. Neteweyeke bi du ziman, çand, siyaset û huqûqê dibe ku hebe; lê ev jî pêdiviya bi nav û nasnameyê ji holê ranake. Ji bo bi hev re man û jiyana pirr nasname û rengên cihê, hilbijartina rêbazên rast hewce dike. Jixwe wekî din jî civak pêk nayên û nayên rêvebirin.

Klanek xwe bi totemekê îfade dike û ev yek jî nîşan dide û piştrast dike ku ev rastî çiqasî kevn e. Ji bo totem, mirov bi awayekî besîd dikare bibêje ku nasnameya klanê ye. Mirov hînê jî dikare vê têkiliyê li cem hin klan û qebîleyan bibîne.

**Civaka Sumeran**

Civaka Sumeran xwe bi nasnameya perestgehê îfade dikir û bi vê jî têkiliya di navbera bawerî û navlêkirinê de nîşan dida. Perestgeh formeke tevna têkiliyan e. Ji bo civak maneyê bide xwe, gihîştiye asteke analîtîk. Wexta mirov li tevahiya têkiliyên di perestgehê de binêre, ango li nasnameya wê binêre, têrê dike ku mirov bi giranî wê civakê nas bike. Di roja me ya îro de gelek nav û paşnavên sembolîk û muccered hînê berfireh in, û hebûna civakê bi giranî nîşan didin. Perestgeha bajêr, xweda û xwedawendên bajêr, gelek nîşaneyan didin me ku civak xwediyê çiqas hêzê ye û xwediyê kîjan têgînan e. Hînê jî gelek qîmetê bi mekanên pîroz didin, ev jî ji ber nirxê nasnameya wan e. Bi vî awayî dikarin xwe bibînin. Jixwe têgihiştina em jêre cewherî dibêjin jî ev e. Nasname têgihîştinê îfade dike. Têgîna herî bi serwextî û têgihiştî ya der barê hebûna xwe de ye.

Di dînên yekxwedayî de nasnameya civakê dîn û xwedê bi xwe ne. Civakeke bê dîn, dînekî bê civak kes tesewir nake. Weke encama vê têkiliyê mirov dikare dîn û xwedayê wî, weke bûyera serwextbûna civakê li hebûna xwe bi nav bike. Ji bo mirov civakên Îslamî nas bike divê mirov binêre çendîn li têgihiştina dînî serwextbûn e. Bêguman aîdiyetên wan ên din jî hene. Mînak weke nasnameya cinsî, nasnameya siyasî, nasnameya qebîleyî, nasnameya çînî, nasnameya entelektuelî û hwd. Lê li van bi tevahî mohra giştî ya dînî heye. Atîna û Roma bi serê xwe nasname ne. Ez behsa serdema antîk dikim. Welatîbûna Atîna û Romayê nasnameyeke neqane bû. Bi hêsanî nedidan her kesî. Ev jî dibe nîşan ku bajar çiqasî xwedî şexsiyet û rûmet e. Nasnameya Grek û Îtalîk hînê gelekî pirnisî û bintûte ye.

Di serdema navîn de qewmiyet pêş dikeve. Dîn di vê mijarê de bi fonksiyon û kêrhatiyeke girîng radibin. Mînak, Îslam di heman demê de bilindbûn û têgihiştina Erebtiyê ye. Mûsewîtî bi Cihûtiyê re yek tişt in. Xiristiyantî ji bo Ermenî, Suryanî û Grekên pir zû bûn Xiristiyan nasnameyeke girîng a qewmî jî îfade dike. Di zikhev de hev xwedî dikin. Fonksiyoneke girîng a dînên yekxwedayî ew e ku ji nasnameya eşîr û qebîleyê dibihure. Bi qasî nasname û têgihiştina netewe nebe jî têgihiştina qewmî bi giranî li serdema navîn li Rojhilata Naverast pêkhatineke civakî ye ku dînên yekxwedayî têde bi tesîr bûn. Wexta mirov têkiliya dînan bi qewmiyetê re deyne, mirov dikare wan weke proto-milletgirî (pêş) bi nav bike. Li cem Tirkan dîn amûrekî girîng ê nasnameyê ye. Eger Îslam nebûya, li Rojhilata Naverast wê qewmiyeta tirk û ereb bi îhtimaleke mezin hînê pirnisîbûya. Mînak mirov vê rastiyê dikare bi tirkîtiya Xezarê ya Mûsewî û Erebên Xiristiyan bibîne. Ji bo her gel û qewmî têkiliya wan a bi dîn re encamên cihê dane.

**Li Ewropayê Serdema Navîn**

Li Ewropaya di serdema navîn de belavbûna Xiristiyantiyê bi giranî bi pêşketina qewmî re di zikhev de pêk hatiye. Têgihiştina qewmê hevpar mîna li cem komên qebîleyên berê li cem qebîleyên Tirk û Ereban jî çawa hat dîtin gelekî qels bû. Xiristiyantî beriya moderniteyê di têgihiştina qewmî de bi roleke tesîrê bike rabûye. Ango civaka çûyê ji wan re negotiye 'Hûn Fransewî ne, yan jî Elman in'. Lê bi heman têgihiştina dînî nêzî tevahiya qebîleyên elman û fransî bûye û di çarçoveya nasnameya hevpar de ji bo pêşketina qewmî bûye gavavêtineke mezin. Gava duyemîn jî pêşketina siyasî ye ku bi awayê qraltiyan pêk hatiye. Di qebîleyan de ji bilî dînên hevpar qraltitiyeke wan a hevpar jî pêk hatiye û ev yek di pêkhatina netewe de gava dawî ya herî mezin e. Ev rewş ji bo Franseyê xweser e.

Bi pêşketin û xurtbûna bazarê re têkiliyên civakî zêde bûn û bi vê re em dikarin behsa çêbûn û derketina netewe bikin. Li Ewrûpayê derketina neteweyan destpêkê li gorî vê modelê pêk hatiye. Li gorî vê yekê netewe; têgihiştina qebîleyê + têgihiştina dînî + otorîteya siyasî ya hevpar + tevahiya têkiliyan jî diyardeyeke civakî ye ku li dora bazarê çêdibe. Mirov ji vê re bibêje civaka netewe belkî manedartir be. Netewebûyîn û dewletbûyîn heman tişt nînin.

**Netewebûn û dewletbûn**

Mînak Qraltiya Fransayê hilweşe jî weke neteweya Franseyê wê bimîne û hebûna xwe dewam bike. Eger mirov netewe bi terîfeke giştî bi komên çand û ziman ve girê bide belkî mirov karibe bêtir jê hîn bibe. Lê eger mirov bibêje bi tenê bi çand û ziman netewe diyar dikin wê ev yekê bibe nêzîkbûneke gelekî kêm û teng. Gelek çavkanî hene ku netewe û netewebûyînê pêk tînin. Siyaset, huqûq, şoreş, huner, nexasim wêje, muzîk, bazara ekonomiyê hemû di netewebûyînê de rol digirin. Têkiliya neteweyan yekser bi sîstemên siyasî û ekonomîk re nînin. Dikarin tesîrê li hev bikin.

Netewe mijarek e ku têra xwe şîlo ye. Ji lewra gelekî girîng e ku mirov der heqê vê mijarê de hişyar û bi tewazun be. Civakên roja me ya îro bi piranî civakên netewebûyî ne. Herçiqas komên marjînal ên nebûne netewe hebin jî bi pirranî civak netewe ne. Hema bêje ferdekî neteweya xwe nebe nemaye. Divê mirov netewebûyînê weke rewşeke xwezayî ya civakê bifikire. Tevahiya dîroka şaristaniyan netewe weke krîz bi tenê di sîstema kapîtalîst de qîmeteke xwe ya mezin çêbûye. Ya rastî, li ser navê netewe spekulasyonên xeternak, felaketên mezin amade kirine.

**Netewe û siyaset...**

Pir zêde destnîşankirin û balkişandina ser hêmanên netewe pêk tînin destpêka felaketa ne. Eger em mînak bidin, em ê bibêjin; têkiliya di navbera netewe û siyasetê de hêmana sereke ye ku di pêkhatina îdeolojiya milletgiriyê de rol digire. Rawestgeha dawî ya siyaseta neteweyî wê desthilatdariya faşîzmê be. Netewetiya wêje, dîn û ekonomî sor dike wê heman encamê bide. Yekdestiya kapîtalîst li ser navê çareserkirina krîzan, rêya herî hêsan hildibijêre û bi tevahî hêmanên netewe pêk tînin ango ekonomî, dîn, huqûq, huner, spor, dîplomasî û li ser navê welatparêziyê çi hebe bi netewebûyîneke xurt digihîne yekparebûneke bi rêkûpêk û bi vî awayî faktoreke bi tenê ya civakê nahêle ku neke desthilatdar û li gorî her neteweyî dikare bihesibîne ku ew ê herî xurt e. Encamên vê gelekî bi tehlûke û xeternak bûne. Ewrûpa veguherandine gola xwînê, li tevahiya dinyayê rê li ber şeran û encamên di dîrokê de nedîtî vekiriye. Ev çalakî netewebûyîn nîne; ev dîndarkirina neteweyê ye. Ev jî dînê milletgiriyê ye. Bi awirê sosyolojîk milletgirî dîn e. Ez ê di sernavê pêwendîdar de li ser vê mijarê rawest im.

Dîn bi xwe jî ji ber ku tehlûkeya qewmiyetgiriyê dizanin, bûne xwedî helwesteke hevgirtî û enternasyonalîst ango helwesteke ummetparêz. Di vê mijarê de dema herî krêt a dîroka şaristaniyê dema kapîtalîzmê ye.

Ji bo neteweyan modela herî kêrhatî modela neteweya demokratîk e. Pir girîng e ku mirov fêhm bike, di mijara netewe de civaka demokratîk di warê çareserkirinê de ew civak e ku dikare vê modelê pêşde bibe. Netewe, herî baş dikarin di sîstema civaka demokratîk de çêbibin û pêş bikevin. Divê ne bi şer û pevçûnê, bi têgihiştina dewlemendiya çandî piştgiriya hev bikin û heta dikarin neteweyê netewan (neteweyê jor) weke qonaxeke dîrokî pêk bînin. Ji bo netewe nebin sedema şeran, di nava piştgirî û aştiyê de weke dewlemendiyeke çandî bi hev re bijîn hewcedarî bi sîstema demokratîk heye. Ji ber ku mijar gelekî girîng e, ez hêvî dikim ku her cara wextê wê hat, bi berfirehî guftûgo bikim.

Ji bo rizgarbûna ji pirsgirêkên netewe; divê mirov netewe înkar neke, faktorên wî pêk tînin zêde netewî neke, netewe bi faktorên wî pêk tînin rave neke, nexasim divê mirov wan bi rêya siyasî zêde neke destikê desthilatdariyên milletgir û li hemberî vê jî divê mirov têgihiştina li neteweya demokratîk pêşde bibe. Rêbazeke bi vî rengî wê çareserker be.



** Ji Pirtûka Şaristaniya Kapîtalîst Serdema Qralên Tazî û Xwedayên Bêmaske hatiye wergirtin.*


# Rojên bê sîber -|-

Ji ber ku leşker jî nêzîkdibûn min ji hevalan re got: "Herin xwe xilas bikin, tenê narincokekê ji min re bihêlin"

RIZGAR ÊRSÎ

Dema dinya ber bi tarîbûnê ve diçû, hevalan gotin; "divê em derkevin û pir lez bikin." Lê min got; "bila hinekî din dem bi ser re derbas bibe paşê em ê derkevin." Ji ber ku em wisa derkevin û hîn dijmin li ser serê me ye nebaş e û dibe ku dijmin cihê çûyîna me nasbike û derbeyekî li me bide, ji bo wê em hineke din jî man. Demjimêr bû 9'ê şevê, me got: "Em niha derkevin." Di wê navberê de yek-du heval hatin û ji me re gotin: "Em gêjbûne û ger hûn me bihêlin vir dê baş be." Lê me ji wan re got "nabe!" Ji ber ku li wê derê mayîn tê wateya tunebûnê û îmhayê. Em çûne cihê wê yekîneya ku xwe radestî dijmin kiribû. Me dît bi rastî jî pir li wê derê xistibûn, lê hîn jî fermandarê wê yekîneyê di xew de bû. Me jê re got: "ev xewa mirinê ye, çawa tu bi ewqas lêdana dijmin û îxaneta wan sê kesan nehisiyayî."

Ya me jî heyanî me li cihê wê yekîneyê nenihêrt, me nizanîbû ku ew yekîne xwe radestî dijmin kiriye û dema me xwest em wan hevalan jî bigrin û birêkevin, wê gavê em bi meselaya wan xeberdar bûn. Ew kesên ku reviyane hertiştê xwe di cîh de hiştibûn û xwe radestî dijmin kiribûn. Jixwe gelek heval di nava wan kunan de û di nava wê avê de bûn. Ji lewre dema ku narincokên dijmin li nêzîkî wan diteqiya ji ber avê bandora teknîka dijmin li wan nekiribû. Dema ku em rêketin ji bona ku em hevdû wenda nekin, me bi kefiya hevdû girt. Em hinekî di wan kunan de meşiyan û ji cihekî re derketin. Dûrbîna şevê jî li cem me hebû. Dema me dûrbîna xwe li derdoran gerand, me dît ku dijmin gelek dever girtine, lê devereke tenê vekirî maye. Ew rê jî bi milê çiyayê Qelenderan ve diçû û ew der jî dolikeke biçûke. Çiqasî me ew rê bi dûrbînê keşif kir jî, lê me tiştek nedît. Lewre me biryar da ku em bi wî milî ve biçin. Jixwe cihê ku emê biçûnayê jî ew milbû. Dibe ku dijmin bi zanebûn jî ew dolik vala hiştibe. Jixwe piştî wê em têgihiştin ku jorî wê li ser serê çiyayê Qelenderan jî dijmin hebû, lê me ji xwe re digot: "divê em ji vê derê derkevin." Beriya ku em derkevin me hinek bi hev re gotobêjkir û me got: "Çi dibe bila bibe pêwîst e em ji vê derê derkevin. Eger em ji vê derê derkevin û dijmin li me jî bide pêwîst e tu kes nezivire van kunan. Eger pir zehmetî hate kişandin, kîjan heval dikare bi kîjan rêkê xwe xilasbike, bila xwe xilasbike. Her hevalekî dikare bi serê xwe, xwe xilasbike û xwe bighîne rêxistinê." Feraset û nêzîktiya me ev bû.



Em bi vî rengî yek bi yek ji nava wan kunan derketin. Di serî de tiştek nebû. Lê hevalê di dawiyê de dihat xwediyê çeka B-7 bû. Dema ku xwest ji kunê derkeve, çeka wî li keviran ket. Jixwe ji bo em bikaribin bi hesanî tevbigerin û xwe ji çemberê xilas bikin, me barê xwe hemû li şûna xwe hiştin. Dema ku çeka wî hevalî li keviran ket, wê çaxê dijmin bi me hesiya û êdî careke din bi narinceyan û bi çekên heyî li wan şikêran xistin. Em derketin û me rêka xwe berdewam kir. Dijmin ferq kir ku em ji wê derê derketine. Lê bi misogerî nedizanî ka em derketine an na? Aliyê ku em berve diçûn li beramberî me çeka 57 danîbûn û gelek çekên giran yên din jî hebûn û her dem li wê dolikê didan. Ji ber vê meşa nîv demjimêrê me di 3-4 demjimêran de bi zorê qut dikir.

Me di wê navberê de xwe gehande sirtê û em pir rehetbûn. Me li wê derê dîsa heval bi şiklê koman bi cih kirin. Hejmara hevalê mane 17 hevalbûn. Ji bo ku em bikaribin hevdû biparêzin, bi şiklê sê koman me xwe saxlemkir. Demjimêr derdora 8 tan bû. Fermandarê leşkeran ji wan re digotin: "Hûn çi dikin?" Bersiva leşkeran ew bû ku ewê niha bikevin hundirê wan kunên ku em tê de ne û ew ê me bigirin. Wan texmîn dikir ku em hîn di wan kunan de ne. Demjimêr bû 10 ê seharê, leşkeran êrîşî wan şikêran kirin û ketin nava wan kunan de. Me jî hem bi çavê xwe li wan temaşedikir û hem jî bi rêya bêtêlê li wan guhdarî dikir, ka çi dibêjin çi nabêjin? Paşî leşkeran ji fermandarê xwe re digotin: "Kes nemaye û hemû ji vê derê çûne."

Fermandarê wan aciz bû û ji wan re xeberên pir pîs kirin û got:

"Hûn dayika xwe jî bifroşin û hûn çi dikin bikin, lê divê hûn wan bibînin." Leşkeran jora me jî girtîbûn û helikopterên sîkorskî dihatin û li derdoran leşker bicih dikirin. Nêzîkê 30 leşkeran çentê xwe danîn û hemû jî EM-16 bi wan re hebûn. Ew leşker ketin wî sirtê em tê de û ber bi me ve hatin. Hevalan xeber da ku vaye leşker tên. Me jî li pêşiya wê yekîneyê kemîn danî. Hevalê me yên dîtir dema nîvro êdî dengê xwe bilind dikirin. Weke ku êdî rewş başbûye û êdî dijmin bi ser me de nayê, wisa dihizirîn û weke ku her tişt başbûye û me roj xilaskiriye. Her çendî me kevir jî tavêtin wan hevalan da ku wan hişyar bikin lê wan hevalan dengê me nedibihîstin û hinekî rehetbûbûn.

Ew yekîneya hêzên teybet hatin û ketin nava me de. Hevalan lêxistin û sê ji wan hatin kuştin. Hevalan xwestin çekên wan ji ser wan rakin, lê hinek hevalan nehiştin û gotin: "Pêwîst e em hişyarbin ji bo derbeyê nexwin." Jixwe me di destpêkê de dixwest em li wan bidin û xwe bi şûnve bikşînin. Bi qasî 100 gavan me xwe bişûn ve da. Me dît ku li pêşiya me sirtekî wisa bilind heye û di wî sirtî de nêzî 300-400 leşkerên dijmin hene. Lê bi meyzandina me re, me hew dît ku hemû bi hev re rabûne ser piyan. Ji wê demê û heyanî niha jî em tênegihiştin ka ji bo çi ew leşker rabûne ser xwe. Jixwe em ber bi wan ve diçûn. Me yekser hêza xwe parçe kir. 4-5 hevalên keç jî li cem me bûn. Me hêza xwe kire sê parçe. Komek ji me wê xwe bi jêr de berdin û bala dijmin bikşînin ser xwe. Hevalên din jî bi şiklê du yekîneyan, wê xwe ji nava dijmin derxînin. Hîn em li cem hevbûn û hevalê din jî dixwestin birêkevin, min dît ku herdu yekîneyên ji hev qutbûyîne bûne yek û bi rê ketin ber bi pesara çiyayê jorî me ve diçin. Me jî berwar xwe berda ber bi jêr de.

Min wê demê bêtêla xwe ya biçûk jibîrkiribû, Lê hevalê Rojhat bêtêl anîbû, hevalê Rojhat bi eslê xwe ji Efrînê bû, berpirsyarê yekîneya xebatê gel bû. Dema em dimeşiyan dijimin jî em dişopandin û bi bazdan li pey me dihat. Li pêşiya me jî bi sikorskiyan leşker dihatin bi cihkirin. Hevalê Rojhat gazî min kir û got: "Vaye bêtêla te li cem min e." Ez jî wê demê li xwe zivirîm û di wê navberê de min ji lingê xwe fîşekek xwar.

Wexta ez birîndarbûm û ji ser hişê xwe çûm. Lê piştî demekî dema ku ez bi ser hişê xwe ve hatim, min dît ku ez li ser milê havala me. Ji ber ku leşker jî nêzîkdibûn min ji hevalan re got:

"Min deynin, biçin û herin xwe xilas bikin, tenê narincokek ji min re bihêlin." Hevalan ev yek qebûl nekirin, lê min ji wan re got: "Hûn biçin, ger hûn neçin rêxistin wê nizanibe ev bûyer bi çi awayî rûdaye."

Me nedizanî ka hevalê din xilasbûne an na. Bi wî awayî min ew rêkirin û min ji wan re got:

"Mereqa min nekin ez ê xwe veşêrim û ger leşkeran ez dîtim ez ê narincoka xwe bi xwe û wan de biteqînim."

## Dengê pênûsê

*Delalê dilan, roniya*
*çavan*
*Roj û çira hemû*
*dilan*
*Ew herdu peyvên te*
*digotin*
*Niha bi rengê te xêz-*
*kirî ne*
*Li ser rûbarê dilê min*
*Pêta agirê dilê roja*
*min*
*Kûr û har e*
*Herdem hêvî dê di-*
*bare*
*Deşt û zozan*
*Mêrg û kanî*
*Tevna jîna wî dirêsin*
*Tu roj û jîn î*
*Mîna gulek bi sêneh*
*Û strî...*
*Di nav girava ger-*
*dûna dilê min de*
*Melevaniyê dikî*
*Bi sebir û aramî*
*Li qiraxên dilê wî dik-*
*evin*
*Peravên avê...*
*Hêlîna xewnên şevan*
*Bi rengê keskesorê*
*Hatibûn xemilandin*
*Carînan kêf û şahî be*
*jî*
*Zindana reş û tarî*
*Ronî nabe bi fînd û çi-*
*rayan...*
*Reng, deng û awaz*
*Tenê pênûs e!*

VEZÎR KAYAR
ZINDANA ÇEWLIKÊ

## Jana kurdiya min

*Çima ji Kurdîtiya min*
*Ji çendî huzn*
*Ji dîrokek bi kovan...*
*Serpêhatiyek dojehîn...*
*Li pey kuştinan maye*
*Dilên parçebûyî...*
*Xem û xeyalên min...*
*Ken û girînên min...*
*Lehengî û tirsa min*
*Hemû parçewesle!*
*Ziyek xembar dimîne li*
*ser dil...*
*Ji dinyayê kerixîme*
*Axînan radihêlim*
*Di nava xumamiyek*
*sor de...*
*Li nav tenêtiya min*
*Dixuricin hemû berxwe-*
*dêr û serhildêr*
*Bi tu tiştî haş nabim*
*Li paş dîwarek dimîne*
*Hemû bîrewerî...*
*Û dîrokek tije ji kerban*
*Arîtmetîk jî nizanê*
*êşên mîn...*

MERIWAN ŞIRO
GIRTÎGEHA SÊRTÊ

## Qerf Henek

Pêkutiyên dibistanên vî welatî




Dîsa jîtem li ser kar e




www.arsivakurdi.org

Rupel 12++++++:Layout 1  17.09.2010  13:10  Page 1

**Rojeva Welat**
18 Îlon 2010 Hejmar: 11 Sal:1
www.welat.com

**ROJEVA WELAT**
**Zozan Basın Yayın Adına**
**İmtiyaz Sahibi:** Eser UYANSIZ
**Yazı işleri Müdürü:** Sevim KAPLAN

*Yönetim Yerî:* Diclekent Bulvarı Termil Apt. Kat:3 No:9 Kayapınar / DİYARBAKIR
*İdare Tel:* 0 (412) 251 38 88

*Yayın (Weşan)*
*TEL:* 0 (412) 237 48 90-91
*Fax:* 0 (412) 237 48 89
Baskı *(ÇAP):*
*Stenbol:* Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler Mevkii Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A Küçükçekmece / İstanbul
*Tel:* 0 (212) 580 63 81
*Edene:* Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş İstîklal mah. İstîklal. Cad. *No:* 44 Seyhan / Adana

Yaygın süreli yayındır.



# Warê Xwedayan bê xwedî maye

# Deyr Yaqûp

## (Keşîşxaneya Yaqûp)

**Mehmet Alî ERTAŞ- AMED**

Gelo kîjan welat war û berhemên dîrokî bê xwedî dihêle. Gelo kîjan welat nirxên xwe yên dîrokî terkî wêraniyê dike. Ger ku ev nirxên dîrokî yên Kurdistanê li Antalya, Îzmîr, Stenbolê bûna; dewlet dê çiqas lê xwedî derketa. Dê çiqas bêxwedî bihiştana û wêran bikirana. Ev berhem û şûnwarên dîrokî yên Kurdistanê çiqas hatine naskirin. Ev warên bêhempa û awarte ku dirok, çand û jiyan têde veşartiye çiqas hatine naskirin. Ev şûnwarên heybet ku mirovan dike evîndarê xwe çiqas hatine lêkolînkirin. Belê! ev berhem û şûnwarên ku dîrokê û çanda serdema neolotîk bi zimanê keviran nivîsandiye û dîrokê nemir dike; îro bi destê dewletê hatiye wêrankirin. Îro ev berhemên giranbiha ji ber bê eleqeya dewletê, li şûna bibe warê tûrîzm û seyranê, bûye lûsa teyr û tilûran, bûye gov û wêran bûye.

Riha ne tenê warê hewra, dêr û mizgeftan e. Ne tenê warê çand û dîrokê ye. Bi qasî di warê ol, çand û dîrokê de cihekî taybet digire, ew qasî di warê perwerdehî û ilmê de jî cihekî taybet digire. Çawa tê gotin yekemîn zanîngeha cîhanê li Herranê hatiye avakirin, yekemîn keşîşxane jî li vir hatiye avakirin. Ev Keşîşxaneya Deyr Yakop a zêdeyî 2 hezar sal koka xwe bi nava axa pîroz de berdaye, niha wêran bûye. Keşîşxaneya ku di nava gel de wekî "Textê Nemrût" tê zanîn, bi mîmarî û avakirina xwe cihekî bêhempa û sosret e; ji ber dewletê lê xwedîtî nekiriye û nehatiye parastin, niha hemû dîwar û xweşikbûna wê, motîf û rengên wê di hevaya germahiya Rihayê de hiliya ye û wêran bûye. Ev warê ku roj lê zer ava dibe û sor diçe ava mirovan dike evindarê xwe. Mirov, ji temaşekirina rojava û rojhilat têr nabe. Ev textê ku bi saetan roj li ezman di nava aso de li hemberî wî dîlanê digire, hêjayî temaşekirinê ye. Li vî textî roj naxwaze biçe ava.

### Dîmeneke bi heybet

Li Eywana Textê Nemrûd temaşekirina Rihayê û deşta Herranê mirovan mest û serxweş dike. Li vî textî bajar dikeve hembêza mirov û dibe mîna teyrê baz û li ser bajar bilind dibe. Wekî mirov bi dorbînê li derdorê xwe temaşe bike.

Li Rihayê bi qasî dêr pêş ketine ew qas keşîşxane jî pêş ketine. Keşîşxaneya Deyr Yakop, Keşîşxaneya Çardeq li lûtkeyê çiya yên bilind hatine avakirin. Bi taybetî ji civakê dûr û li bilindahiyê hatine avakirin. Keşîşane zêdetir li cihê bêdeng, warê bilbil şahlûran hatine avakirin. Ev keşîşxaneyên li lûtkeyên çiyayê hatine avakirin ji bo perwerdehiyê cihekî taybet û stratejîk e.

### Ji bo Aryu hatiye avakirin

Keşîşxaneya Yakop, ango Textê Nemrûd li çiyayê başûrê Rihayê hatiye avakirin. Di Rihayê de keşîşxaneya herî mezin û dîrokî ye. Ev keşîşxane li dervê bajar hatiye avakirin. 4 kîlometre li rojavayê meskenê Eyyub Pexember li ser çiyayê bilind di hundirê zinakekî mezin de hatiye kolandin. Di nava gel de wekî "Textê Nemrûd" tê naskirin. Wekî "Aşê cinan" jî nasîn. Li gorî efsaneyan ji bo kes zêde cihê Nemrûd baş nizanibin û der barê xebatê wî de agahiyan negrin, wekî Aşê Cina bi nav kiriye. Tê gotin ku kesên bi dora Keşîşê diketin cin dihatin wan û ew tazî dikin. Ji ber vê yekê Aşê Cinan hatiye gotin. Texnê Nemrût ku heta 50 sal berê li dervê bajar bû, niha ji ber bajar mezin bûye ketiye nava perekî bajar. Ev keşîşxane Beriya Zayinê

> Li Eywana Textê Nemrûd temaşekirina Rihayê û deşta Herranê mirovan mest dike.Îro ev berhemên giranbuha ji ber bê eleqeya dewletê, li şûna bibe warê tûrîzm û seyranê, bûye lûsa teyr û tilûran, bûye gov û wêran bûye

di sedsala 1'emîn de di serdema pûtperestan de hate avakirin. Keşîşxane ji bo malbata kurê Qralê Edessa Abgar Manu, Aryu hatiye avakirin. Niha ev keşîşxane tev hilweşiya ye û tenê kevirên bîrdarî û gorê li şûna waran maye.

Li gorî hin çavkaniyan wekî manastir ango keşîşxaneyê derbas dibe. Ev avahiya ku di lat de hatiye kolandin ji rojava ber bi rojhilat ve direj dibe û çarqosî ye. Li ser 2 qatan ava bûye. Keşîşxane di zinarê çiyayê kilsînî de hatiye kolandin. Li jora keşîşkaneyê li ser pişta keşîşxaneyê gora abîde ku ji 3 qatan pêk tê bi mîmariyek awarte hatiye avakirin.Lê ev mîmariya awarte îro tev hilweşiya ye. Tê zanîn ku Qralê Edessa li vir hatiye veşartin. Ketina vê goristanê vedibe hundirê odeya keşîşxaneyê. Kemerên bakur, rojhilat û rojava bi miariya xaç û nîşê 2 serî (arkosolium) hatiye avakirin.

### Bi motîfan hatiye nexşandin

Li ser pişta mîmariya xaç (Arkosolium) kevirên mezin ên lento hatine pêçan. Di deriyê ketinê yê qatê jêr de bi xêz û fîguran motîfê çivîkekî hatiye nexşandin. Ev fîgur û motîf diyar dike ku ruh wekî çûkekî difire û diçe. Ev fîgur di serdema îslamê de jî li ser gelek kevirên goran hatine neqişandin. Avahiya mezin a li dervê bîrdarê gora dimîne, bi korîdorên bi kemer, vedibe hundirê gorên bi xaçînî. Ev korîdor diçin ser gora kurê Manu Şaredu û hevsera wî Ameşşemeş. Deriyê goristanê li qatê jêr aliyê bakur bi kevirên hatine hilweşandin vedibe derve. Li ser deriyê kevirînî ku ketiye xwarê fîgurê zilamekî hatiye kolandin. Li kêleka vî fîgurê zilam ê serê xwe daye balgiyê, 2 fîgurên din ên yek jê jin yek jê zilam ku li ser kursiyê rûniştine hatine nexişandin.

Li rojhilatê bîrdeya gorê ya 3 qat a çorqosî ku li bakurê rojava dikeve, 2 kîtabe hatiye bicih kirin. Li ser van 2 kîtabeyan bi zimanê Grekî û Suryanî nivîs hatine nivîsandin. Di 2 kîtabeyan de jî nivîsa "Kurê Manû Şaredu û hevsera wî Ameşşemeş" hatiye nivîsandin. Ger ku dîroka Xanedanê Aryu yê Berî Zaniyê di sedsala 1'emîn de jiyaye li ber çavan bê girtin, goristan beriya olê Xirîstaniyê di serdema paganîst (putperest) de hatiye avakirin. Lê ev war û perestgeha dîrokî, di serdema Epîskoposê Pirsûsê Azîz Yakob de (Piştî Zayinê 451-521) wekî keşîşxane hatiye bikar anîn. Odeyên Keşiş ên li Rojhilatê Keşîşxaneyê di kevir de hatine kolandin van agahiyan pişterast dike. Li ser kevirên kemera Abîdeya Gora Mezin rozenên xaç hatine nexşandin. Ev rozetên xaç, dide xuyakirin ku ev Abîdeyên Gora Mezin di serdema xirîstiyanan de ji aliyê malbata qral ve hatiye bikar anîn. Di nava gel de tê gotin ku Yaqûp Pêxember li vir maye. Tê gotin ku Navê Deyr Yakob jî vir hatiye girtin.

### Di nava kevir de ava kirine

Keşîşxane li bin agabeydeya Gora Nemrûd di nava kevir de hatiye kolandin. Dema mirov dikeve nava zinarê wê wekî xwe bera nava bajarê kevirînî de. 4 deriyên smetrîk û çargozî vedibin hundirê keşîşxanê. Di hundirê keşîşxaneyêde beşên cur be cur hatine kolandin. Li Ser diwarên keşişxaneyê motîfa xaçê û şibakeyên çarqosî û niv kevan hatine kolandin. Derî û diwarên dêrê wekî bi kêre penêr hatibe jêkirin kevir hatiye birin û kolandin. Gelek motîf û fîgurên cuda li ser dîwar hatine nexşandin. Dîsa li tenişta keşişxaneyê çend odeyên din di zinar de hatine kolandin.



## Çîroka Textê Nemrûd

Li gorî efsaneyê tê gotin ku ji ber deşta Rihayê pir germ e, Qral Nemrûd ketiye nava fikr û ramana dê çawa xwe hênik bike? Ji bo karibe xwe ji germa deşta Rihayê biparêze her tim li cihê bilind geriya ye. Piştre li Başûrê Keleha Rihayê li ser çiyayekî mezin meskenek ava kiriye. Ev der navenda zozanekî fireh e. Ji bo xwe hênik bike, li ser vî tahtê lûtkeya çiya ku dikarî bi hêzanî çarhawîrê xwe bibîne di hundirê tahtê de avahiyekê ava dike. Bi hezaran kole dide xebitandin û zikê tahtê qul dike. Bi hezaran karker 4 demsalên salê vî tahtê kilsînî dikolin û di hundirê tahdê te avahiyek 2 qat ava dikin. Tê gotin ku ev avahiya li Rojhilatê Textê Nemrûd hatiye kolandin, havînan wekî sarincê hênîk û zivistanan jî wekî sobeyê germ e. Nemrûd, havînan li vir xwe ji germê diparêze û hênik dike. Li gorî efsaneyê xwarina bi hezaran karkerên ku li vir dixebitî, li Gundê Qazanê yê Deşta Harraê ji dest didan dest heta Textê Nemrûd.

www.arsivakurd.org